A. GERNAS

# Zembilfiroş



A. GERNAS

# ZEMBİLFIROŞ

WEŞANÊN ROJA NÛ

ISBN 917672036 - 5
© A. GERNAS
Printed in Sweden
Stockholm 1995

Wêneya bergê pêşin : **Lennart Asp**

**Weşanên Roja Nû : 37**

Adress :
Gustavslundsvägen 168 A, 1 tr.
161 36 Bromma / Stockholm
Sweden

A. GERNAS

# ZEMBİLFIROŞ

(Piyes-Drama)

Weşanên
**ROJA NÛ**

# Pêşgotın

Daxwaziya ku barê nıvisandına vê berhemê da ser mılê mın, tırsa wındabûna klasikên me yên kevın bû, ku lı ba mın ev klasikên pênasa tarix, çand, zıman û folklora gelê me ye. Mın dı vê berhemê da efsaneya Zembilfıroş, ku dı nav xelkê da xwedi ciheke bı rûmet û hezkıri ye, da dest û bı şêweyek cuda pêşkêşi raya gel kır.

Ev efsane dı edebiyata me ya tesewufi da mırcaneke yekta ye. Bı taybeti lı Kurdıstana Bakûr, dı edebiyata me ya nıviski da zêde cih negırtıye û nehatiye nıvisandın. Daxwaziya mın ew bû ku, ev efsane bı gelek şêweyan bête naskırın. Lewra ji, mın Zembilfıroş bı zımaneki tiyatral, wek piyes nıvisi da ku bı vê şêweyê ji dı nav gel da belav bıbe, felsefa jiyanê ya Zembilfıroş bête nasin, dı navbera wê û felsefe û kultura iroyin da pırek saz bıbe. Her çıqas efsane xwedi kıraseke tesewufi ye ji, gelek motivên wê yên exlaqi û kulturi balkêş ın, karın bıbın dersdarê serdema iroyin. Bêguman dersgırtın gırêdayi şırovekırınê ye, lê çend motiv hene ku jı bo herkesi û herdem derbas dıbın. Wek, exlaqeki bılınd, baweriya xurt, rasti û durusti, jıhevnaskırına başi û xırabi, rûmeta sınet û keda dest û hwd.

Lı ali dın armanceki vê xebatê ji ew bû ku, ev berhem dıgel şêweya piyes bı şêweya efsane û şırovekırına wê ji derê pêş. Û ya heri gıring ji, bı

zımanê Kurdi bête nıvisandın da ku ev zımanê me yê xweş delal dı nıvisandın û xwendınê da ciheki fıreh bıgre, bı karanina wi teşwiq bıke.

Ez hêvidar ım ku ev xebat hest û ramanên ronakbirên Kurd şiyar bıke, bala wan bıkşine ser xızneya me ya çandi û folklori yên kevın, lı ser bermahiyên weha raberzin û lêkolinan xurttır û kûrtır bıke. Dıvê qet jı bira me neçe ku, pejırandına pênasa me ya neteweyi, jı ali çand, zıman, tarix, cografya û wd., gırêdayi ronikırın û aşkerakırına bermahiyên me yên kevın ın. Qet şık tunebe ku, wındabûna berhemên kevın ispatkırına pênasa me dıjwartır û helandına me ji hêsantır dıke. Em tev baş dızanın ku, dıjmınê gelê me çıqas gırani dıde ser wındakırına berhem û bermahiyên me yên kevın!.. Çı tıştên ku karın bıbın şahıd û ispata pênasa me ya neteweyi, bı zanebûn jı ali dagırkerên Kurdıstanê va tên wındakırın û talankırın. Jı ber vê xeterê berpırsiyariyek gıran dıkeve ser mılê her Kurdên ku destê wan pênûs dıgre û karın karên lêkolina berhem û bermahiyên me yên kevın bıkın, bınıvisın û û wana derxın meydanê...

Wek ku jı navê pırtûkê ji tê xuyan, mıjar, wek piyes pêşkêşkırına efsaneya Zembilfıroş e. Lê ez qima xwe bı viya naynım, dıgel piyesê çirokê ji pêşkêş dıkım, çend varyantên efsaneyê rûbari hev dıkım û riya tesewufê û Zembilfıroş dıdım xuyan da ku bala xwendekaran bıkşinım ser xızna folklora me, da ku efsaneya Zembilfıroş pırali bıdım nasin.

## Derbari piyesê da çend agahdari

Jı bo piyesê hın agahdari pêşkêş dıkım da ku rejisor an ji rêvebırên piyesê, beri listına piyesê xwedi hın destnişan û pêşniyarên sereke bın.

Ne hemû be ji, pıraniya piyesê bı zımaneke şıêrki hatıye nıvisin. Ev reng bı du armanca hatıye amadekırın:

1- Jı ber ku diyaloga çirokê ya ku dı navbera Zembilfıroş û Xatûnê da derbas dıbe, wek şıêr hatıye nıvisandın û her weha lı nav xelkê belav bûye. Ez ji, jı wê şêweyê ra sadıq dıminım û bı zımaneke nêzi orijinala wê ya klasik piyesê amade dıkım.

2- Şêweyeke weha imkan û mecalên fırehtır peyda dıke da ku piyes bı şêweya diyalogê, muzıkal an ji opera bête listın.

**Çend pırsên tekniki**

Jı bo rejisorên piyesê çend agahdariyên tekniki ev ın:

**a) Navê listıkvanan :**

Jı xeyni navê Derwêş, Zembilfıroş, Xatûnê, Wezir û Lawê Mir, navên mayin xeyali ne û jı ali mın va hatıne ditın.

Herweha dı destpêka sehneyan da hın zarokên listıkvan hene ku dı nav parantêzê da wek (zarok - K) an ji (Zarok - L) hatıne destnişankırın. Zarok-L, tê maneya zarokê kurin; Zarok-K ji, tê maneya zaroka keçin.

**b) Motıvên cıl û bergên listıkvanan:**

"Pêşsehne" ne tê da, dı hemû sehneyên mayin da cıl û libasên listıkvanan ên sedsalên çardeh heta şazdehan ın.

Pêşsehne, dı serdema me ya iroyin da dıqewıme. Cıl û bergên listıkvanan ên salên navbera 1960-70 ne.

c) **Navginên ku wê dı piyesê da bên bı kar anin:**

Qesd jı navginan, eşyayên ku wê dı sehneyan da bên bı kar anin ın. Dıvê lı gor serdema xwe bın û eşyayên nûjen têkıl nebın. Navginên ronahiyê yên mala Xatûnê, mala Lawê Mir û mala Zembilfıroş fınd, çıra, lembeyên bı don û fıtil û hwd. ın.

Çek û silahên ku bêne bı kar anin kêr, xencer, şûr, mertal, tir û kevan û hwd. in.

d) **Nasandına malıkên şıêr ên orijinal ên nav xelkê û yên mın:**

Ew şıêr û beytên ku jı 1 heta 36'an hatıne destnişan kırın, beytên orijinal ên çirokê ne, yên mayin afırandınên mın bı xwe ne.

e) **Derbari sehneyan da:**

Pevgırêdana sehneyan û jı hev veqetandına wan hatıne destnişan kırın, lê rejisorên piyesê lı gor imkan û navginên sehnê, eger pêwist bıbinın karın hın sehneyan bıgıhinın hev, navbırên sehneyan bı ronahi û hın teknikên dın jı hev bıqetinın.

**Rola Derwêş :**

Wek ku jı piyesê ji tê xuyan, rola heri gıring a derwêş e û ew jı seri heta dawiyê lı sehnê ye. Her wısa elbana destê Derwêş ji, jı bo fonmuzika sehnê instrumenta sereke ye.

Lı vê derê Derwêş, zanyarê serdema kevın û ronakê pêşerojê ye û herweha wek simgeyeki tarixê ye.

# PÊŞSEHNE

## LİSTIKVAN

**Derwêş**
**Hesen** (zarok-L)
**Zirek** (zarok-L)
**Mızgin** (zarok-K)
**Cımşid** (zarok-L)
**Koçer** (zarok-L)
**Leyla** (zarok-K)
**Apê Fılit**
**Pira Dırê**
**Rızgo**

*(Derwêş bı ritmên beyt lı elbanê dıxe û jı paş temaşevanan dıkeve salonê. Jı nava temaşevanan derbas dıbe û dertê ser şanoya perde gırti. Perde vedıbe. Derwêş lı niveka şanoyê rûdınê. Jı heqiba mılê xwe nan û pivazek hışk derdıxe. Navpışta xwe vedıke û lı pêşberi xwe radıxe. Nanê xwe datine serê û dest bı xwarınê dıke. Demek şûnda jı quncıkên tari yên şanoyê yek bı yek, dudo bı dudo zarok bı bazdanê tên û lı dora Derwêş rûdınên. Ronahiyek gılover lı ser Derwêş û zarokan e.)*

**Hesen :** *(bı şermokiyek şeytani)*
Apê Derwêş!.. Tê jı mera hınek lı elbanê xi?.
**Derwêş :** *(nan dıcû)*
Baş e kurê mın. Hınek sebır bıkın, ez nanê xwe bıxwım..
**Zirek :** *(bı meraq û dev bı ken)*
Apê Derwêş!.. qey mala te tune?..
**Derwêş :** Mala mın?... Tê çı bıki jı mala mın kurê mın? Vi welati gışt mala mın e.

*(Zarok dı bın çavan da lı hev dınıhêrın, bı dızi dıkenın û dıbe pıste pısta wan. Jı ber ku gotına Derwêş nakeve serê wan)*

**Mızgin :** *(şerm dıke û gava xeber dıde, xwe dıquncıfine ser hev)*
Apo, jına te heye, zarokên te hene?..
**Derwêş :** *(dıbışıre û serê xwe lı vi ali wi ali dıhejine)*
Wısa xuyaye ku, ez iro jı destê we xılas nabım. Na keça mın na, jına mın tune, lê zarokên mın gelek ın.
**Cımşid :** Qey jına te mıriye?..
**Derwêş :** Na kurê mın na, jına mın tune ku bımre.

*(Zarok ecêbmayi dıminın. Devê xwe dıkın guhê hev hın tışt jı hev ra dıbêjın. Hesen xwe nagre bı dengeki bılınd dıbe tiqe tiqa wi, wek ku bêje Derwêş din e, çı ye?..)*

**Koçer :** Apó, ka zarokên te lı ku derê ne?..
**Derwêş :** Zarokên mın... Zarokên mın lı her deri hene.
**Leyla :** *(bı meraq)*
Lı gundê me ji, zarokên te hene?..
**Derwêş :** *(bı henek lê bı tewreki cıddi)*
Belê lı vi gundê ji hene. Ma hûn wan nas nakın?..
**Hesen :** *(bı devkeniyek şeytani)*
Hevalno, apê Derwêş tınazê xwe bı we dıke!..

*(Zarok dı nav meraq û gotınên Hesen da dıkevın dudıli, lê disa ji Koçer xwe ranagıre û bı safiti dıpırse)*

**Koçer :** Zarokên te ki ne? Navê wan çı ne?
**Derwêş :** *(bı şefqat û hezkırın)*
Hûn hemû zarokên mın ın. Ez dıçım ku derê pêşi zarok tên dora mın. Ez jı zarokan pır hez dıkım, çunki ew bı aqıl ın. Ew guhdariya mın dıkın, çirok û beytên mın guhdari dıkın. Lewma ji, hemû zarokên vi welati wek zarokên mın ın. Delaliyên apê xwe, ez qet nezewıci me û zarokên mın ji çê nebûne..
**Hesen :** *(bı qureti û jı nava xwe têr keneki bı tınaz dıke. Lı benda qedandına gotına Derwêş namine)*
Mın jı we ra negot.. Apê Derwêş tınazê xwe bı we dıke... *(lı ali Koçer dımıhêre û bı hın işaretên çav û destan wi dıke şûna ehmeqan)*
**Derwêş :** *(hereket û işaretên Hesen dıbine û bı şiretkari)*
Kurê mın, delalê mın, tu laweki bı aqıl i!. Merıv jı

hevalê xwe ra wısa nake... Şireta mın lı we, tucar hevalê xwe bıçûk nexinın. Jı hev hez bıkın!...

Leyla : *(Bı şermoki)*
Apê Derwêş?.
Derwêş : Haaa.. bêje keça mın.
Leyla : Diya mın dıgot.., Derwêş cih û warê wan tune, ew tım dıgerın. Ew dindar ın. Lı elbanê dıxın û beyt û çirokan dıbêjın. Tê jı me ra çirokeki bıbêji?
Derwêş : Diya te rast gotıye keça mın... Hın tıştên ku nehatıne gotın û hûn nızanın ji, ez ê jı we ra bêjım. Derwêş ji, wek hemû insanên dın ın. Ew ji, wek herkesi xwedi malbateki ne. Hetta hınek derwêş hene jı malbatên dewlemendan ın, jı malên mir û began ın. Lê ew jı bo baweriyên xwe yên dini û carna ji bı evineke xwedayi dev jı hemû tışti berdıdın. Bı jiyaneki feqiri û derdkêşi, jı hemû xırabi û derewan dûr dıkevın riya Xwedê. Ew zanyarên dini ne. Xelkê şiyar dıkın. Lı hemû dınyayê derwêşi heye. Dı her dini da kesên ku mina mın lı nav xelkê dıgerın hene.

*(Dı vê navberê da jın, mêr, kal û pirên gund jı çarali tên dora Derwêş. Lı ser destê wan cûre cûre xwarın tinın û datinın ber Derwêş)*

Rast e keça mın, Derwêş tım dıgerın û lı tu ciheki daimi naminın. Lê ew parsê nakın û destê xwe jı kesi ra venakın. Xelk xêra xwe çı bıde wan pê razi dıbın. Xelk qedrê wan dıgre. Ew ji, lıgel elbana xwe beyt û çirokên dini jı xelkê ra dıbêjın, dılê wan xweş dıkın, wana jı xırabi, derew û tıştên nebaş dıparêzın. Şireta mın lı we, hûn ji wek dê û bavên xwe qedır û qimeta

Derwêşan, dengbêj û çirokbêjan bızanıbın, bı çavê gerok û mırtıvan lı wan nenıhêrın!..
**Apê Flit :** *(Sereyê gund e û bı rûmet e)*
Bı xêr û xweşi hati Derwêşê delal. Tu çawa yi baş i?
**Derwêş :** Dı nav xêrê da bi, xwedê jı te razi be Apê Flit. Tu çawa yi gelo?.

**Apê Flit :** Tu zûva ne xuya bûyi, me meraq kır Xwedê neke tışteki hatıbe serê te?..
**Derwêş :** Xwedê kêmaniya we nede, Xwedê qewet û sıhetê bıde Apê Flit. Çı bêjım, bı Xwedê ez çûbûm ciheki dûr, êhh.. ixtiyari ji heye, êdi çelengiya mınê berê ji nemaye.
**Pira Dırê :** *(Jıneke sere ye, dı gund da qedır û qimeta wê gelek heye)*
Ser çava ser sera hati bırakê Derwêş. Gelo zarokan te acız kır an na?..
**Derwêş :** Çavê te lı ser gula be pira Dırê. Xema nexwe, zarok mın acız nekırıne, ew pır bı aqıl û dı edeba xwe da ne.
**Rızgo :** *(Zılameki navsere ye)*
Ka jı me ra bêje, gelo çı deng û behsên dınyayê hene?
**Derwêş :** Ez ê çı bêjım bırakê Rızgo... Ez û deng û behsên dınyayê çı tevi hev ın.. Lê tıştê ku ez dıbinım, xweşi û bedewiyên dınyayê yek bı yek wında dıbın. Ne qedır maye ne qimet, ne insaneti ne din û diyanet. Ketıye bın dest û piyan hezkırın û rûmet. Ez ê çı bêjım...
Çend roj berê lı gundeki Mêrdinê bûm,
Bı van herdû çavan şahıdê bûyereki bûm.
Kuştın, talan, din û iman bûbûn pênc pere.
Jı bo tışteki netışt xal û xwarzi bı hev ketıbûn.

Heci Temoyek hebû, keça xwe dabû kaleki pir,
Dı dev da nemabû dıran, ketıbû jı hış û bir.
Keçık pazdeh sali bû, bavê guh neda gazınên wê
Bı zora mal û pera, bazar û qelen dan kelxê pir.

**Pira Dırê :** *(Herdu destê xwe berbı jor dıke û bı nıfır û dılsotın)*
Mala Heci Temo lı ber miratê keve,
Kezeba wi qul bıbe, xêrê jı xwe nebine.
Gelo qet tırsa Xwedê tunebû dı dıl da?
Ma keça wi pez e, wê dıfroşe bı zora qelen e?

*(Bı nıfırên Pira Dırê ra, bı berketın lı çarali nıfırên gundiyan lı nava hev dıqelıbın)*

**Derwêş :** *(Bı serê xwe gotınên Pira Dırê dımıqırine û berdewam dıke)*
Keçık dıl berdabû kurê xalê
Şand pey lawık, got bıra bê
Got, bıra bê û mın bırevine
Hêj ku nebûme rızqê devê vi kelxê.

**Apê Flit :** *(acız dıbe)*
Gava dê û bav keçên xwe dıdın mêr
Pê ra pırs dıkın dıl û rızayên wan têr
Ger carna guh nedın ji dıl û rızayên wan
Keça panzdeh sali nadın kelxên bêxêr.

Xuyaye Heci Temo dılê baviti lı aliki avêtiye,
Wijdan û xireta xwe bı mal û pera fırotiye.
Aferin jı keçıkê ra, wê ji ya bı dılê xwe kırıye
Bêşerefê bavê xwe qurbana xwe kırıye.

**Derwêş :** *(Gotınê Apê Flit lı hesabê wi tê. Bı keser serê xwe dıhejine)*
Lawık keçikê revand pışta çiyê
Dengê revandınê bı gund ket serapê
Heci Temo got, kafır kuşti be iro
Cendekê herduyan dıxwazım weynın ber pê.

**Rızgo :** *(bı tehditkari destê xwe berbı pêş dırêj dıke)*
Heyla bênamûs... Ker kurê kerê.., çavên wi xwin ketınê.
**Derwêş :** Belê bırakê Rızgo... Ez lı ber hukmê Xwedê heyri mame. Ez tênagıhijım!.. Mıletê me çıma weha edûyê hev ın, lı ava serê hev dıgerın.
**Apê Flit :** *(Bı meraq)*
Herê Derwêşê delal, ka te negot ku çı bû bı herdu dıldaran?..
**Derwêş :** *(Qırıka wi tıje dıbe û bihnek kûr berdıde)*
Gund bû du bend, herkes bazda rabû ser piya,
Heryek jı aliki va xwe gıhand tıvıng û modoliya.
Bı hev ketın,te dıgo qey yek Rom e yê dın Fıreng,
Pır xwin rıjiya, pır terş û talan çû jı herdu aliya.

Herdû ali xal û xwarziyê hev bûn
Jı eyni eşirê, miratxurê hev bûn
Serhışki, tımatiya pere û malê dınê
Wana kor kırıbû, lı ber lıngan çûn.

Herdu dıldarên cıwan kuştın lı çiya
Anin cendekên wan, avêtın ber piya
Kızin bı dılê merıv dıket jı halê wan ra
Hê ji hêrs û kina Heci Temo nedıtefiya.

**Pira Dırê :** Wax, wax, wax... Te lê diye, xınzirê xınzir.. Hê ji dılê wi rehet nebûye ha! Mala mınê jı herdu dıldaran ra, bı mırazê xwe şa nebûn û çûn...
Derwêş : Belê Pira Dırê, wax ku çawa wax!.. Lı welatê me halê dıldaran her ev e. Bêmırazi bûye qedera wan.

Ma tenê du evin, tenê du can
Dı vê rêyê da çûn, bûn qurban
Ma emê çawa jı bir bıkın
Memê Alan û Zina Zêdan.

Ma em ê çawa jı bir bıkın
Siyabendê delûdin û Xeca Zêrin
Kerr û Kulık, Huso û Naza din
Cembeli û Bınevşa narin...

Belê ew negıhan mırazê xwe
Bı urf û adet, bı kêf û dawet
Wan bı xem dagırt qewlê evina xwe
Bê gazın sılav kırın lı mırına bêbext

Rast e, wan dı riya evinê da can da
Lê jı hev hez kırın têri xwe dı dıl da
His kırın pêlên agırê evinê, doş bûn
Sermest bûn, dı qesra dıldaran da

Lê evin ne tenê yek reng û yek kıras e
Car heye, viyaneke yekali û nenas e
Wek evina Xatûna gerden bı mori ye
Ku Zembilfıroş jê nake rev û xılas e.

*(Pıştı van gılı û gazınan, Derwêş radıke elbana xwe bı rıtma beyt dest bı çiroka Zembilfıroş dıke.)*

**Derwêş :**

Ey dıl were disan bı coş
Carek jı caran mey bınoş (1)
Bıkın qıseta Zembilfıroş
Da seh bıkın hikayetê.

Zembilfıroş ew lawê mir bû
Bı mal û mılk û bı eşir bû
Nazdar û pır hezkırı bû
Ka seh kın serpêhatiyê.

*(Jı bo demeki kurt sehne tari dıbe)*

# SEHNE I

<u>LİSTIKVAN :</u>

- Derwêş
- Lawê Mir
- Wezir
- Çeko
- Dara
- Rızgo
- Baro

*(Jı efektê dengê xurıstê, rewşa darıstaneki û nêçirê tê pêşkêş kırın.*
*Perde vedıbe û didemek jı jiyana heywana ya bêdeng a xurısti û bêtırs tê xuyan. Nışkava heywanên nêçirê lı vi ali wi ali dırevın. Her wısa nêçirvan ji, bı dû wan dıkevın, xwe dıtelinın, bı tir û kevanên xwe nişan dıgrın. Dema ku perde vedıbe, bı elbane ritmeki tê gırtın û ev ritm lı gor rewşa nêçirê, lı gor heyecana wê tempoya xwe bılınd û nızım dıke da ku hestên temaşevanan rake.*
*Çend deqqe nêçirvan û heywanên nêçirê lı vi ali wi ali dırevın. Pıştre, nêçirvan lı cıheki lı hev kom dıbın.)*

**Lawê Mir :** Baro!... Rûvi bali Rızgo da reviya! Tu xwe bıde mılê rastê! Hesen, tu ji jı mılê çepê da werê! Ez û Çeko ji, jı paşva dıdın ser. De lez kın, wi jı dest nerevinın!..

*(Qasi deqqeyek lı gor talimata Mir, dor lı rûvi tê gırtın. Çeko jı Rızgo ra dest dıhejine, hın işaretan dıdê û paşê bang dıke.)*

**Çeko :** Rızgo!...
*(Rızgo lı ali Çeko dınıhêre, bı işaretên pırsiyariyê û wındakırına rûvi dest û seri dıhejine. Çeko kema bınya wi işaret dıke û hınek ji bı sitemkari)*
**Çeko :** Malxırabo, dıbê qey ava reş bı çavê da hatiye. Zû ke, jı paşva vegere û pêşiya kemê bıgre!

*(Çeko, Rızgo, Baro û Dara dor lı rûviyê dıgrın û bêdeng dor lê teng dıkın. Jı nışkava rûvi jı pışt kemê*

*baz dıde. Wê hıngê Baro tirekê berdıdê û rûvi bı ser hev ra dıqelıbine.)*

**Dara :** Bıji Baro!.. Mın çavê te xwaro.

*(Herçar tir û kevanên xwe radıkın û şabûna xwe nışan dıdın.*
*Sehneya nêçirê bı kuştına pezkûviyek û kiroşkek çend deqeyên dın ji berdewam dıke. Pıştre tev lı cibeki dıgıhijın hev û berê xwe dıdın malê. Sehne jı bo demeki tê tarikırın .*

---

*(Beri ku disa rohni bıbe, Derwêş lı elbanê dıxe û çiroka Zembilfıroş bı strani, wek ku dı nava xelkê da gotın, dıdomine.*

**Derwêş :**
Zembilfıroş lawkê delal e
Xweş cıwan û bı bejn û bal e
Jı nêçirê tê berbı mal e
Guhdari kın çı bı serda tê.

*(Perde vedıbe. Lawê Mir, wezirê wi û çar xulam ji lı dû wan jı nêçirê vedıgerın. Lı ser şıverêyek Lawê Mir û Wezir ketıne suhbetê.)*

**Lawê Mir :**
Mirê miran, maqûlê bavê mın,
carna behsa demên kevn û nêçirê dıke.
Behsa şênahiya bax û baxçe û
darûberên Kurdıstanê dıke.
Behsa heywanên nêçirê
û texlidên wan dıke...
Ka ew şêr?
Ka ew pılıng?
Ka ew beraz û hırçên darıstanên me?

**Wezir :** *(Dıkeve ramanên kûr, bı xembariya demên bori keserek dıkşine)*
Herê...., herê Mirê mın ê delal, rast e.
Dema ku em gıhiştınê, *(dıl bı keser e, çav lı dûr dımıhêre û bihnek mıtale dıke)*
disa yek hebna hebûn.

Ew heywan jı ber xwe va neqeliyan bêguman.
Welatê me bû meydana şer gelek caran,
ket ber êrişên Romi û Moxolan,
bû meydana şerê navbera Osmaniyan,
Ecem û Ereban.
Welatê me yê xweş û delal,
ket ber êrişên dagırkeran.
Kambax kırın,
şewıtandın,
çı ket ber wan;
talan kırın
û jı xwe ra bırın.
Heywanên me ji qır kırın.
Êhh.... mıletê me ji nezan bû,
nêçireke bêserûber dıkırın!..

*(Hestên Lawê Mir radıbın, bı berketın, bı êş û jana kambaxkırına heyiyên welatê xwe hêrs dıbe)*

Lawê Mir :
Dıvê em fermaneki derxın
nêçira bêserûber qedexe bıkın!

Wezir : *(Bı şahi û daxwaziyeke xurt)*
Dılê mirê mın gelek pak e,
gotına te rast û dırust e,
fermanek weha êdi pêwist e...

Derwêş : *(Bı ritmeki ku şabûnê dıde hısandın lı elbanê dıxe û vê xeberê belav dıke)*
Ferman e!
Fermana mirê miran e!

Hatiye qedexekırın,
nêçira bêserûber!
Hatiye qedexe kırın,
Sotandına dar û ber!
Hatiye qedexe kırın,
kambax kırına welatê xweş û rınd!
Hatiye qedexe kırın
Hemû kuştın lı rûyê dınê!

**Lawê Mir :** *(Bala xwe dıkşine ser bûyereke nêçirê û hınek bı raman e)*
Pezkûviyê me gelek lı dû xwe gerand iro..
Dema ku em lı dû wê bûn,
bistek çiroka Siyabend û Xecê hat ber çavê mın.
Demekê xofek kete dılê mın,
û pê ra ji, mêrxasi
û rıka Siyabend qewet da lıngê mın.

**Wezir :**
Maqûlê mın, bı Xwedê ew fıkır jı mın ra ji çê bû, lê mın zanıbû ku ew jı ber nişangêriya te nafılıte. Mirê mın, eger destûra te hebe ez ê pırsekê bıkım.

**Lawê Mir :**
Fermo!

**Wezir :**
Wexta çılê lawê te yê delal bıqede!.. Gelo dema navlêkırınê nehatiye?

**Lawê Mir :**
Rast e, êdi dem hatiye.

Mın lı ba xwe navek hılbıjartiye.
Eger destûra bavê mın û te hebe,
mın lı ba xwe navê Mem lêkıriye!..

Wezir :
Ew çı gotıne Mirê mın. Navê ku te hılbıjartiye, bı mın ji pır xweş e. Lewra ew nav, navê "Memê Alan" e, diyariya bav û kalê me ye. Êdi jı wi xweştır çı heye.

Lawê Mir :
Eger jı mın ra keçek ji çê bıbe, ez ê navê wê ji Xecê deynım. Lê wek ku mın got, beri her tışti destûra bavê mın lazım e.

*(Bı vi suhbetê, Lawê Mir û Wezir dı ber gorıstanekê da derbas dıbın. Gava dıgıhên tanga gorıstanê, nışkava ronahi dıkeve ser gorıstanek û bala Lawê Mir dıkeve ser didema wê gorıstanê.*
*Qafıkeki seri yê mıriyan derketiye ser rûyê gorê. Lawê Mir bı meraq û ecêbmayi jı wezir pırs dıke)*

Lawê Mir :
Wezir!..
Tu dıkari bêji, gelo ev çı hikmet e?

Wezir :
Evya mırın e
jı jiyana vê dınyayê qetandiye benê xwe
yani qafıkê serê insaneki mıri ye, mirê mın.
Lawê Mir : *(Şaş û mıtal dımine û bı balkêşi xeber dıde)*

Mırın!...
Çı tışteki tırsehêz e mırın!..
Nake guhdari
Tu mir i
Yan feqir i...
Çaxa roj û demê te temam dıbe
Pırs nake jı te
Mılk û emlakê te
Pırs nake
Lı xêr û gunehê te...

**Wezir :**
Rast e maqûlê mın..
Lê mırın ji xılasi nine...
Gelo çend kes
Hesabê wê dınyayê
Bı bir tine
Û bı wijdanek rehet
Serê xwe datine?

**Lawê Mir :** *(bı bışırinek xembar)*
Wijdanek rehet....*(bı çavên pırsiyari û bı mıtale bihnek berdıde)* Gelo çend kes?..
Çend kes lı vê dınyayê
Bı kar û emelên xwe
Bı têkıliyên xwe
Bı dılpakiya xwe
Bı edaleta xwe
Şertê wijdanek rehet peyda kıriye?
Çend kes lı vê dınyayê
Bı helali
Bı keda destê xwe

Bı hezkırın û dılsozi
Bê nefs û çavnebari
Xwe jı vê jiyanê ra amade kıriye?

**Wezir :**
Hejmara kesên weha
Gelek kêm ın Mirê mın.
Lê lı rûyê erdê insan
Dıji û dıxebıte
Wek ku tunebe mırın!....
İnsan e lı vê dınyayê hukumdar
Jı bo berjewendiyên xwe
Jı bo hukmê xwe
Lı wijdanek rehet nagere tucar..

**Lawê Mir :** *(bı tınaz dıbışıre û)*
Lê mırın ji
Wek xwe dıke hercar!..

**Wezir :**
Belê mirê mın...
Ew guhdariya kesi nake, mıxabın...

**Lawê Mir :** *(Bı mıtale)*
Dıdım ber hev û jı xwe pırs dıkım,
Gelo ez ê ji bıkevım vi hali?...

**Wezir :**
Dûri te be mirê mın,
ev aqûbet lı serê me hemûya ne,
Xwedê, xwedayek mezın e mirê mın...

**Lawê Mir :** *(dıkeve mıtaleke kûr, reng û rûçık lê namine. Tırs û evineke Xwedayi dıkeve dılê wi. Bı haleki mıtalekıri...)*
Ez.., ez ku kurê mirê miran ım
Serdarê hezaran ım
Xwedi hemû ılmê cihan ım
Bı mamoste,
Bı dengbêj,
Bı çirokbêj,
Bı hozan û diwan ım.
Ez..., ez ku xwedi qesr û xan ım
Keleh û pawan ım
Deşt û zozan,
Zevi û çiyan ım
Bı evineke Xwedayi dılgıran ım

Bı keda destê xwe
Bı keda destê xwe
Bıborinım jiyana xwe,
Jı nıha pêva
Ne mir ım
Ne xanedan ım
Yek jı gel ım
Dıçım nava gel..
û lı wijdanek rehet dıgerım!..

*(Sehne tari dıbe û pêra ji dengê elbana dewrêş û çiroka wi tê bıhistın)*

**Dewrêş :**
Ramanên Lawê mir serûbın bûn
Xem û mıtalên wi kûr û pırr bûn
Bıryar da ku dûr keve jı miriti û hebûn

Bı jın û malbatê bışêwıre û bıke qısetê.

# SEHNE II

<u>LİSTIKVAN :</u>

- Lawê Mir
- Jına Zembilfıroş

*(Sehne rohni dıbe. Lawê Mir û xanıma wi, lı oda xwe bı hevra şêwrê dıkın. Sehne hım trajik e, hım ji mızgıniya jiyaneke nû ye).*

**Lawê Mir :**
Ey xanıma mın a porzêrin
Dêmsorgul, zar gelek şirin
Mın bıryar daye bı evin
Dıgel te bıkım qısetê

Ez ê berdım qesr û qonaxe
Berê xwe bıdım nav mıllete
Hin bıkım sınetên deste
Qayil bıbım bı qısmetê

Zor nadım te dılzêrinê
Bê qeyd û şert lı dû mın bê
Zanım wê pır zor lı te bê
Berdana vê seltenetê

Tu azad i dı bıryara xwe da
Bımini dı nav ziv û zêr da
Dıjwar e jiyan lı derva
Gunehkar nakım te hurmetê

**Jına Mir :**
Mirê mın ê nazık û delal
Hım helal i hım ji heval
Dılpakiya te bê misal
Te'z lal kırım bı vê qısetê

Rast e, dest jı mal û mılk nabe
Dû hebûnê feqiri nabe
Lê ev jiyan qet bê te nabe
Bê te çı bıkım bı cennetê

*(Sehne tari dıbe û pêra ji perde tê gırtın)*

# NAVBIR 1

# SEHNE III

<u>**LİSTIKVAN :**</u>

- Hesınger
- Xerat
- Hostayê diwara
- Çolang
- Zembilfıroş
- Xatûnê

*(Lı sehnê 6 heta 8 kes lı dora agır rûnıştine. Dı navbera wan da lı ser afırandêri, hunerên destkari û kedkariyê suhbetek dest pê dıke. Ango kesên ku lı dora agır rûnıştıne, didemek jı hunermendên cuda yên destkariyê radıxın pêş çavan.)*

**Hesınger :**
Ez ım ez..
Şagırtê Kawayê hesınger
Dısotinım, dıtewinım hesın bı sari
Çêdıkım gisnên cot
Tevr û bêra destê cotkar
Das û çakûçê karger
Şûr û mertal
Xencer û kalanê destê şerger
Şergerê azadiyê
Şergerê rojên gıran.

**Xerat :**
Ez ım ez..
Xerat ım ez.
Hunermendê sındoqê bûkan
Text û dolabên malan
Haletê destê cotkaran
Destiyê çakûçê karkeran
Dergûşê zarokan
Zarokên pêşerojê
Pêşeroja welatê me Kurdan.

**Hostayê Diwara :**
Ez ım ez..

Hostayê diwara me ez.
Lêdıkım avahiyan
Qesr û qonax
Bırc û kelehan
Bendên pêşiya av û çeman
Bı hunera destê mın
Lêdıbın stara insan.

**Çolang :**
Ez ım ez..
Çolang ım ez.
Xemla mala hunera destên mın.
Dırêsım çavi bı çavi,
Tej û xaliçeyan bı delali.
Bı nûra çav
Bı keda dest
Nexşên xem û xeyalan
Hesret û evinan dıhonım.
Ez ım ez..
Xezineya kultura Kurd ım ez.

**Derwêş :** *(Dı nav koma hunermendan da ye)*
Zembilfıroş lawkê rewal bû
Bı kulfet û ehl û eyal bû ( 2 )
Husneki Ûsıf lı bal bû
Heq rızaqê qısmetê.

Qewin ew lawê feqir bû
Hertım Xwedê dı bir bû ( 3 )
Pêşê xwe da ew jir bû
Ew bı dest hebû sınetê.

Şuxlê wi selık û tebeq bû
Qimeta selıkan wereq bû ( 4 )
Hertım ew rast heq bû
Pê debıri kulfetê.

*(Sehne tari dıbe û dengê elbanê bılınd dıbe)*

# SEHNE IV

LİSTIKVAN :

- Derwêş
- Zembilfıroş
- Xatûnê
- Xecê (keç)
- Nesrin (keç)
- Bınevş (keç)
- Jınek
- Jınek sere
- Gulê (keç)
- Caringek

*(Zembilfıraş cûrbecûr zembilan avêtiye ser mılên xwe, lı kolanan dıgere û zembilan dıfroşe. Demek şunda dı ber qesra Xatûnê da derbas dıbe û jı bo fırotına zembilan bang dıke. Lê beri ku Zembılfıroş lı şanoyê xuya bıbe, Derwêş lı qunceki rûnıştiye, lı elbanê dıxe û çirokê weha dıdomine.)*

**Derwêş :**
Ew bı dest zembil bı dest
Dıbıre bazarê bı qesd ( 5 )
Xwarın, nan dıhat bı dest
Razi dıbû qısmetê.

*(Dengê elbana Dewrêş çıqas dıçe kêm dıbe û banga Zembilfıroş tê bıhistın)*

**Zembilfıroş :**
Zembil...! Zembil..
Werın zembilan..
Mın honandiye
Bı nûra çavan
Bı hunera destan.
Ew layıqê destê
Xanım û xatûnan.

*(Bı dengê Zembilfıroş ra, Xatûnê dertê ber pencerê û bı heyrani qasek dıkeve temaşa Zembilfıroş. Lı kolanê, mıllet lı ser serê Zembilfıroş pıçıkiye. Didemek jı bazara zembilan û fırotına wan tê pêş çavan û demek dom dıke.)*

**Xecê :**

Zembilfıroş!.. zembilên te çı sıpehi ne
**Nesrin :**
Herê xwengê, ew ji wek xwediyê xwe ne
**Bınevş :**
Tew., ger te bızanıbıya ku çend kes çaverê ne
**Jınek :**
Yeka mina Xatûnê lı ber penceran dıheline...
**Jınek sere :**
Keçê, şerm û heya we nine?
Zembilfıroş lawek pak û dılzêrin e
Gotın û gale galê we dı bir da nine..
**Nesrin :**
Metıkê!..
Bı Xwedê me tu niyetek xırab nine
Gotınên me tev henek û yari ne

**Zembilfıroş:** *(Gotın û gale galê navbera jınan dıbıhize, lê xwe acız nake. Dı ber xwe da dıbışıre û)*
Dev jı wan berde dayê!.
Cıvat xweş e ku tê da hebe germahi,
dostani û henek û yari ne.

*( Demek weha bazara zembilan berdewam dıke. Ronahiya ser bazara zembilan tê tarikırın û ronahi dıde ser oda Xatûnê û dengê Derwêş û elbana wi tê bıhistın.)*

**Derwêş :**
Her dema ku selkan tine
Xatûnek jor da dıbine ( 6 )
Bı dıl û can dıhebine
Dıl kete pêla muhbetê.

*(Xatûnê lı ber pencera oda xwe ketiye mıtalan. Nışkava tışteki tê bira wê. Kêfek tê wê, reng û rûçık lê geş dıbe. Destê xwe lı hev dıxe û caringên wê dıkevın hundır.)*

**Xatûnê :**
Hûn caringê mın ên delal
Zû zû bıkın, herın jı mal ( 7 )
Lawık lı jêr e, herne lı bal
Bêjne, Mir te dıxwaze dindar.

*(Caringên keleş berbı derva dılezinın. Sehna oda Xatûnê tê tarikırın û ronahi cardın dıde ser Zembilfıroş û bazara Zembilan. Caringên Xatûnê bı lez tên ba Zembilfıroş û yek jı wan Zembilfıroş jı xelkê dorê hınek dûr dıke û şirin şirin dıbêje)*

**Caringek :**
Zembilfıroş, lawıkê delal
Te sıneta selkê dı al ( 8 )
Hınek husna Ûsıb lı bal
Mir te dıxwaze, kerem ke mal.

**Zembilfıroş :**
Hûn caringê husn û cemal
Mın bıhistiye mir ne lı mal ( 9 )
Selıka bı kê ra bıkım bazar?

*(Dema ku Zembilfıroş û caring xeber dıdın, dı navbera jın û keçên bazarê da pıstepıstek dest pê dıke û jı aliki va ji guhan lı xeberdanên navbera Zembilfıroş û caringê bel dıkın. Zembilfıroş bı dudıli dıke ku here,*

*hın gotınên jın û keçên bazarê dıkevın guhên wi.)*

**Gulê :**
Zembilfıroş!.., Mir ne lı mal e
Tê bı kê ra zembilan bıki bazar e?...

**Jınek :**
Tew dinê.. tu kurr û kem nebi...
Mir çı ye, cihê Xatûnê lê hebi!..

**Jınek sere :**
Bes bıkın gıli û qelinek
Heddê xwe zanıbın carek
Zembilfıroş lawkê dindar e
Jê nayê tu xırabi û zırar e!..

*(Caring lı pêş, Zembilfıroş lı dû wan berbı qesrê dıçın. Wê hıngê sehne tari dıbe û dengê elbana Dewrêş cardın bılınd dıbe.)*

**Derwêş :**
Zembilfıroş çû bı der da
Gul Xatûn rabû jı ber da ( 10 )
Şekır bari jı dev û lêva
Ka guhdari kın qısetê.

*(Cardın rohni dıde ser oda Xatûnê. Xatûnê lı ser diwana xwe rûnıştiye. Hım bı kêf e hım ji bêsebır e. Lı deri dıkeve!.. Caringek berbı deri dıçe. Deri vedıke û pêra ji, lı Xatûnê vedıgere)*

**Caringek:**

Zembilfıroş e Xatûna mın!..

*(Xatûnê bı destan işaret dıde da ku wi berdın hundır û pêra ji işaret dıde caringên xwe ku jı odê derên)*

**Xatûnê :** *(Zembilfıroş bı fedikari lê bı xwe bawer, tê diwana Xatûnê. Xatûnê jı berê radıbe û jı bo rûnıştınê cih nişan dıde)*
Zembilfıroş lawkê dewrêş e
Tu kerem ke were pêş e **( 11 )**
Heqê zembila bıbêje
Ez jı hızna te bûme kerr û gêj e.

**Zembilfıroş :** *(Hêj lı piya ye. Jı gotınên Xatûnê ra şaş û mıtal dımine)*
Wey Xatûna gerdenzêrê
Caringan ez anime vê derê **( 12 )**
Selıka bıfroşım naz û nederê.

**Xatûnê :** *(Bı bışırin)*
Tu ser sera herdu çava
Bazar, bazara mın û te va **( 13 )**
Muhtacê te me bı dıl û çava.

**Zembilfıroş :** *(Têdıgıhije ku Xatûnê, wi jı bo bazara zembilan neaniye)*
Xatûna delal, zende bazın
Tu lı mın meke gazın
Jın ne layıq e bıke bazar **( 14 )**
Xeber rast ın têne ser zar
Selıka bı kê ra bıkım bazar?

**Xatûnê :** *(Berpê dıçe, bı destê zembilfıroş dıgıre û wi berbı*

*doşeka xwe dıkşine û pêra ji)*
Ya bı xêr te kır lawkê nezan
Ez rast bêjım, tu bızan
Te xweş kır, tu hati vır ( 15 )
Tu hım şahi, hım şevbıhêr
Ev e jı te ra bazar û xêr!...

**Zembilfıroş :** *(Zembilfıroş jı rengeki dıkeve rengeki dın, dı bın şoqê da ye. Pıştre lı xwe dıwerqıle û bı serbılindi)*
Wey Xatûna gerdenzêr tê
Em xeberdın jı cımaetê ( 16 )
Ew xeber jı eslê mın ra
(Bêrê û) bê qayde tê.

**Xatûnê :** *(Bı hereketên nazdar pûşiya serê xwe datine, porê xwe lı vi ali wi ali ba dıke û)*
Zembilfıroş lawkê feqir
Tevi bıde zılf û herir ( 17 )
Tu were rûnê lı doşeka Mir
Gotına mın jı te ra toq û zıncir.

**Zembilfıroş :** *(Berepaş berbı deri dıçe û dest bı lavayiya dıke)*
Xatûnê lı mın neke van henekan
Ew pêkeninê qiz û bûkan
Mın berde, herme sûkan ( 18 )
Bıfroşım van selıkan
Pê bıkırım nanê zarokan.
**Xatûnê :** *(Hınek tûre dıbe, xwe dıgıhine ber deri û deri radıde. Vedıgere ser Zembilfıroş û bı dıldari yek bı yek bışkokên singa xwe vedıke û lı razikırına Zembilfıroş dıgere)*
Lawıko bes e bıki van gıliyan
Ez ê bıdme te memkê xumriyan

Lı te wer kım çekê cındiyan ( 19 )
Te derxım jı tar û tengiyan
Guh mede sofi û suniyan.

*(Pışti vê xeberdanê, hêdi hêdi sehne tari dıbe û dengê elbana Dewrêş bılınd dıbe. Demek tenê dengê elbanê dom dıke û pıştre çirok weha tê domandın.)*

Dewrêş :
Zembilfıroş çûn reng û rû ve
Lê şıkestın ejnû û gav e ( 20 )
Tevzê da dıl û hıngav e
Got : "Dı eslê mın da ev nabe".

*(Pışti çarina Dewrêş, demek kurt elbane berdewam dıke û çıqas dıçe deng kêm dıbe. Hêdi hêdi sehne rohni dıbe û Xatûnê dest bı xeberdanê dıke)*

**Xatûnê :** *(Bı lavayi destê xwe davêje sing û berê xwe û)*
Lawıkê nezan, tu çıma şermini
Sılav bıke lı van memıkêd zêrini
Tu yê jı wan xêrê jı xwe ra bıbini ( 21 )
Te ez bı dıl û can va bırım
Te nebinım, ez dımırım...

**Zembilfıroş :**
Gul Xatûn ez tobedar ım
Hurmetê ez bı erz û eyal ım ( 22 )
Zarok bırçine lı mal ın
Ez jı rebê jori nıkarım.

**Xatûnê :**
Rojê şahi dıçın, derbas dıbın

Gul dıgıhijın, dıçılmısın ( **23** )
Tu kêf bıke, kêfa mezın
Bıra gunehê te jı mın bıxwazın.

**Zembilfıroş :**
Xatûna gerden bı mori
Şıxul nabe bı kotek û zori ( **24** )
Tırsa mın jı rebê jori
Xatûnê ez tobedar ım.

**Xatûnê :**
Lawıko were ser şekır û sêvan
Lı wan bımıje bı dev û lêvan ( **25** )
Sing û berê mın jı te ra meydan
Lı ser sıwar be, bajo heyran.

**Zembilfıroş :**
Wey Xatûna aqıl temam
Tu şerbet bi av lı cam ( **27** )
Bedena te lı mın heram
Delalê ez tobedar ım.

**Xatûnê :**
Lawıko eger tu nebêji belê
Ez te bernadım jı kelê ( **28** )
Tuyê bıkşini gelek bedelê
Dıldarê te me bı vi dılê..

**Zembilfıroş :**
Lê lê, lê lê Xatûnê
Bejna te jı dara zeytûnê ( **29** )
Tırsa mın jı agırê êtûnê

Gul Xatûn ez tobedar ım.

*(Bı dengê elbana Dewrêş sehne tari dıbe û dengê beyta Dewrêş tê bıhistın)*

Dewrêş :
Zembilfıroş lawıkê Ebas e
Tena derpê û kıras e ( 30 )
Jı Xatûnê nake xılas e
Jı delalê nake xılas e.

Lawık rast bû bı Xwedê ra
Pır jı wê genca dıkêra ( 31 )
Go : "jı te navê tu zêra
Tu mın xılaski jı zehmetê.

# SEHNE V

<u>LİŞTIKVAN :</u>

- Derwêş
- Xatûnê
- Zembilfıroş
- Caring

*(Xatûnê dı oda xwe da ye. Ketiye ramanên kûr, hêrs bûye, bê aram e.. Jı seriki odê dıçe seriki dın, xwe bı xwe xeber dıde.)*

**Xatûnê :**
Ya Reb, ez ê çı xweli lı serê xwe kım?..
Ez ê çawa dılê lawık nerm bıkım,
Evina dılê xwe jê ra rawe bıkım.
Dıldariya xwe ya rasti,
Hestên xwe yên paqıj
Jê ra diyar bıkım?...
Ew Zembilfıroş e
Lawê feqir e
Lê lı ber husna wi yê ûsıb
Fınd û çıra bê şewq û şemal e
Heq rezaqê qısmetê...
*(lı vi ali wi ali seri dıbe û tine)*
Ya Reb tu bıde mın qewetê..

*(Ser û sinçê xwe, çek û bergên xwe bı keys dıke û lı diwana xwe rûdınê. Demeki kurt mıtale dıke û bı mana bankırına caringek destên xwe lı hev dıxe.. Caringek dıkeve hundır, temene dıbe û lı pêşberi Xatûnê dısekıne.)*

**Xatûnê :**
Tu caringa mın a aqıl kemal
Mın jı te heye hın sewal
Muhba Zembilfıroş ez kırım kerr û lal
Ka bêje, çı ye çare û mecal?..
**Caring:**

Çare û derman bedewiya te ye
Hêvi û guman bejn û bala te ye
Tılsım çav û bırûyên te ye
Wê bêje herê, ku hebe sebra te ye.

**Xatûnê :** *(Wek merıveki bêçare seri dıhejine)*
Bedewiya mın pere nake
Bejn û bala mın tesir nake
Çav û bırûyên mın hukum nake
Êdi sebır evina dıl aş nake.

**Caring :**
Ma ew guh nade mal û mılk
Ziv û zêr, çek û kurk
Ma ew naxwaze xılas bıbe
Jı fırotına tebeq û selık.

**Xatûnê :**
Zembilfıroş lawıkek feqir e
Serbılınd e, jı xwe emin e
Lı balê, qimeta mal û mılk nine
Heq rezaqê keda dest e.

**Xatûnê :** *(Mıtalebûyi dıçe serê odê û vedıgere ba caringê)*
Tu here Zembilfıroş jı zindan derine
Bıkeve bın çengê wi, jı mın ra bine!..

*(Sehne tari dıbe. Dengê elbana Dewrêş bılınd dıbe û serbori dom dıke)*
**Dewrêş :**
Ew çend roj bûn Zembilfıroş gırti
Dı kelê da rûnıştıbû ti û bırçi ( 32 )

Keseki nızanıbû, sax e yan mıri..

Zembilfıroş hevraz dınıhêri
Rûnışt bı halê xwe da gıri ( 33 )
Go: Xweziya mın e bı xelkê mıri.

*(Sehne rohni dıbe û Zembilfıroş bı haleki perişan, ti û bırçi û jı hal keti tinın pêşberi Xatûnê... Xatûnê destên xwe lı hev dıxe, caring û xızmetkar jı odê derdıkevın. Xatûnê berbı Zembilfıroş dıçe, dıkeve bın çengê wi û tine lı ser diwana xwe dıde rûnıştandın û lı hember wi rûdınê.)*

**Xatûnê :**
Lawıko ev çı rık e çı şanazi
Pê kutayi erdê nabi razi
Ma tu melayketi ne insani
Ma tu nabini, jı evina te ketıme çı hali?..

**Zembilfıroş :** *(Bêmecal û bı zor bersiv dıde)*
Xatûna gerden bı mori
Dêm weki sorgula sori ( 34 )
Singa te, wê jı hedê bori
Tırsa mın jı rebê jori. *(pêra ji serê Zembilfıroş dıkeve ber)*

**Xatûnê :** *(destê xwe davêje bınê çena wi û serê wi rast dıke)*
Evina mın ne henek e
Ne yari ye, ne derew e
Rast e, paqıj e, jı dıl e
Dur e, wek ava zelal e.

**Zembilfıroş :**

Mın heye eyal û jın
Bırçine, lı hêviya mın
Bes derê pêşiya mın
Xwe nexine jı çavê mın.

Xatûna şeng û şepal e
Çavreş e ya çavxezal e (35)
Rûsor e gerden bı xal e
Mın berde bıçme mal e.

**Xatûnê :** *(Hêrs û kelegırini dıbe)*
Lawıko bes bık gale gal e
Te bernadım heri mal e
Husna te kırım gêj û lal e
Neşkêne dılê mın, bêle mecal e.

*(Zembilfıroş dıbine ku xılasi jı destê Xatûnê nine, demek mıtalebûyi û bêdeng dımine)*

**Zembilfıroş :** *(Bı bışırandıneke xapinok)*
Xatûna dêm û xal şirin
Mın berde herım riya mısin
Xwe pa kım jı qırêj û bihn
Dıbêjım "herê", bıla kêfa te bê..

*(Hêvi û gumanên Xatûnê jı nû va vedıjenın; reng û rûçık lê vedıbe, lê jı aliki va ji dudıl e!... Dı dawiyê da dıgıhije wê bıryarê ku kındırek lı piyê Zembilfıroş gırêde da ku nereve.)*

**Xatûnê :** *(Bı kêf destan lı hev dıxe, du caring dıkevın hundır)*
Hûn caringên mın ên delal

Herın binın mısinek ava zelal
Da Zembilfıroş xwe bıke helal.

*(Caring mısinek av tine. Zembilfıroş radıke mısinê û jı odê dertê. Pêra sehne tari dıbe û dengê Dewrêş û elbana wi tê bıhistın)*

Derwêş :
Zembilfıroş hılkışiya bırc û bani
Ket mıtalên kûr, mısin dani
Go: "Ya Reb her tu zani"
Ez gunehkar nakım vi cani.

Go: "Merıv careki dıbe ne hezar
Ez ê xwe jı kelê bavêjıme xwar ( 36 )
Herım bıbinım jınık û zar.

*(Xweavêtına Zembilfıroş, lı pışt perdeyeki dawiya sehnê bı alikariya ronahi û hereketên si kare bête nişandan)*

Zembilfıroş xwe avêt jı bırca
Du melek ketın bınê çenga
Wi hêdi danin erdê, lı ser penca
Reviya jı wê derê, dûr ket jı êş û renca.

*(Sehne rohni dıbe. Xatûnê bêsebır e û heyecanek pê gırtiye. Lı vi ali wi ali dıçe û tê, hêvidar e ku wê zembilfıroş jı riya mısinê vegere û daxwaza wê bı cih bine.)*

**Xatûnê :** *(Destan lı hev dıxe, caringek dıkeve hundır)*

Zembilfıroş çû û nehate
Ka bınêre, gelo tıştek bı seri da hate?..

*(Caring baz dıde der. Xatûnê bê tebat e. Ge rûdınê ge radıbe û dıgere, heta ku caring jı derva dıkeve hundır)*

**Caring :** *(Reng lê nemaye, wek şıva nava avê dılerıze)*
Zembilfıroş ne xuyaye
Lı cihê wi mısin maye...

*(Xatûnê kındır dıkşine. - kındıra ku lı piyê Zembilfıroş hatıbû gırê dan- Bı kışandına kındır ra, mısina avê bı teqe req heta odê tê kışandın û av jê dıkışe... Xatûnê jı kerba dıqelıbe û jı hış va dıçe. Caring lı serê wê dıpıçıkın û perde tê gırtın.)*

# NAVBIR 2

# PERDE VI

**LİSTIKVAN :**

- Derwêş
- Xatûnê
- Zılamek
- Xulamek
- Caring
- Hın insan jı kolanê

**Derwêş :**

Xatûnê bı ser hev ra qelıbi car bı car
Reva Zembilfıroş wê kırıbû din û har
Go: "Binın hın cılên feqir û fuqar
Ez ê lê bıgerım tar bı tar".

*(Perde vedıbe. Xatûnê dı nav cılên kevn da xwe nıxamtiye û lı mala Zembilfıroş dıgere. Xulamek û caringek jı dûri va çavnêriya wê dıkın. ev sehne bêdeng e, ango wek pandomim dom dıke tê listın. Xatûnê wek dıldareka hışavêti, wek insanek ti ya ku lı avê dıgere ketiye kolanan û lı vi ali wi ali pêşiya insanan dıbıre û bı lavakari pırsa mala Zembilfıroş dıke... Ev sehneya bêdeng demek weha dom dıke ta ku Xatûnê jı hal dıkeve. Wê hıngê jı zılameki rêwi pırs dıke. Pırskırın bı deng e.)*

**Xatûnê :** *(Bı hêvi û didemek lavayiyê)*
Brako! Ez lı yeki dıgerım mın nema hış e
Cıwanmerd e, bejın zırav û dırêj e
Husnek Ûsıb lı bale, çav û brû reş e
Dı dest da heye sınet, zembil dıfroşe
Navê wi bıxwe ji, Zembilfıroş e.

**Zılamek :**
Zembilfıroş?... ew lawıkê biyani
Bı fam û fıraset, qedır û qimet dızani
Herkes wi dınase bı dılpaki û gırani
*(Bı desta işaret dıke)*
Lı mılê rastê vegere, lı dawiya kolanê ye xani.

*(Jı bo didemek nû sehne tari dıbe û perde tê gırtın)*

# PERDE VII

LİSTIKVAN :

- Derwêş
- Xatûnê
- Jına Zembilfıroş
- Perwin (zarok - K)
- Xecê (zarok - K)
- Mem (zarok - L)
- Zembilfıroş

**Derwêş :**
Demek, dema ku Zembilfıroş ne lı mal e
Jın û zarok lı bendê ketıne haleki ne hal e
Bırçi, perişan mane, ked nemaye lı mal e
Qesda mala Zembilfıroş dıke Xatûna delal e.

*(Sehne rohni dıbe. Jı kûr va dengê ritma elbanê tê. Didemek ne xweş û haleke perişan jı hundırê mala Zembilfıroş tê pêş çavan. Sê (3) zarokên Zembilfıroş dı bınê lıhêfê da xwe pelızandıne û nûze nûza wan e, ji bırçibûnê reng û rûçık lı wan nemaye. Lı qunceki odê kuçıkê agır û lı ser kuçıkê agır beroşeke av dıkele... Jına Zembilfıroş bı ritma elbanê , bı uslûba danseki dramatik, xwe bı xwe gıli gazınan dıke. )*

**Jına Zembilfıroş :**
Zembilfıroş, te tu car me mehrûm nekırıye
Bırçi û muhtac û bendewar nehiştıye
Jı kerba te êdi bı bir naynım bırçibûnê
Meraqa mın, ka çı bı serê te da hatıye.

*(Tê ba zarokan û lı kêleka wan rûdınê. Kesırandın û xemginiya rûyê wê wında dıbe. Bı devkeni destê xwe lı serê zarokan dıgerine û jı bo birkırına bırçibûnê lı aşkırına wan dıgere. Nûze nûza zarokan e.)*

**Jına Zembilfıroş :**
Menalın delalên mın, qurban ım jı we re
Mın jı we re xwarınek xweş daniye sere
Nıha lı ku be wê bê bavê we, ger we hebe sebre
Em ê bı hevre bıxwın, weha çêtır û bı xêr e.

**Perwin :**
Bırçi me dayê, nıkarım xwe ragrım heta bavo bê.
Xecê :
Dayê, ez kerıxime jı nan û dew û şorbê..
Mem :
Dayê wê kengê bavo bê?

**Jına Zembilfıroş :** Ka jı we ra çirokek bêjım heta bavê we bê?.. *(ne bı dılê zarokan be ji, naxwazın zêde dılê diya xwe bışkênın û bı bêdıli bı serê xwe herê dıkın)*
Hebû tunebû, carek jı caran rehme lı dê û bavê hazır û guhdaran. Dı zemaneki da nêzi bajarê Muxurzemin bı navê Ardawid ciheki piroz hebûye. Ardawid dı bın hukmê jıneke cıwan û bedew da bûye. Rojeki lı ber avê jı xwe ra dıgere û dıkeve seyra dar û deviyan, av û çiyayan. Jı nışkava sê sıwar jı ser behrê berbı jınıkê tên...

*(lı deri dıkeve)*
Teq, teq, teq...

**Perwin 1 :** *(Bı vejin û heyecan)*
Bavo hat... bavo hat...

*(Bı teqina deri ra heyecan û vejinek dıkeve nav zarok û diya wan. Lewra dê û zarok pêjna Zembilfıroş dıkın, lewma ji jına Zembilfıroş bı kêf berbı deri dılezine û deri vedıke. Lê bı vekırına deri ra, ew vejin û heyecana ser rûyê wê dıçe û şaşmayin û rûsariyek dıkeve şûnê, mat dıbe û lı rûyê jınıka devê deri dınıhêre.)*

**Xatûnê :**

Roja te bı xêr xuşkê!..

**Jına Zembilfıroş :**
Xêr û xweşi lı te be xuşkê, keremke!..

**Xatûnê :**
Gelo mala Zembilfıroş vê derê ye?

**Jına Zembilfıroş :** *(bı meraq û çavên pırsiyari)*
Belê vê derê ye, xêr e inşallah?..

**Xatûnê :** Şıkır xêr e, lê ez nıkarım lı ser piya lı devê deri xeberdım. Eger hûn mêvana qebûl bıkın?..

**Jına Zembilfıroş :**
Mêvan, mêvanê Xwedê ne... Keremke derbasi hundır bıbe!..

*(Xatûnê derbasi hundır dıbe. Jına Zembilfıroş cih nişan dıde. Xatûnê rûdınê lê jı aliki va ji rewşa hundır raçav dıke.)*

**Jına Zembilfıroş :** *(Bı meraq pırs dıke)*
Bı xêr û xweşi hati.., ser çava ser sera. Eger tu lı meraqa mın bıbori, ez ê du pırsan jı te bıkım. Pırsa yekem derbari xwenasina te ye, ya duyem derbari hevnasina te û Zembilfıroş e?..

**Xatûnê :**
Meraqa te dı cih da ye xuşkê
Tıştê hatıye serê mın, neyê serê tu kesê
Ez ketıme rewşeke gelek dıjwar

Nızanım jı ku dest pê bıkım qısetê

Beri ku behsa xwe û serboriya xwe bıkım
Rê bıde mın da ku alikariya te bıkım.
Zarok bırçine û tıştek lı malê nine
Bı destûra te, lazmatiyên we bı cih binım.

**Jına Zembilfıroş :**
Şıkır jı xwedê ra tu ihtiyaciyek me nine
Zılamê mın hemû lazmatiyên me bı cih tine
Em bı keda dest û qısmetê xwe razi ne
Nıkarım alikariya te qebûl bıkım, bıbexşine.

**Xatûnê :**
Xuşka delal, tu feqir i lê şanaz i
Tu bırçi yi, lê dıldewlemend i
Tu tazi yi, lê pır bı esalet i
Rıca mın qebûl bıke wek yarmeti.

**Jına Zembilfıroş:**
Ez feqir ım, lê jı halê xwe nakım gazın
Şanaz ım, lewra lı malê dınê nine çavê mın
Bı esalet ım, lewra xwedi wıjdanek rehet ım
Serbılınd ım, lewra bı keda destan bawer ım.

**Xatûnê :** *(Bı tewreke masûm û bı lavayi, ji paşıla xwe kisek zêr û emaret derdıxe dırêji Jına Zembilfıroş dıke)*
Rıca mın ew e, tu qebûl bıki wek dıyari
Ne wek yarmeti, ne wek alikari
Wek te ez ji lı wıjdanek rehet dıgerım
Dılê mın nehêle, bıstine bêmıneti.

Bıstine da ku serboriya xwe bêjım
Derd û meraqên dılê xwe bırêjım
Çareseriya derdê mın lı ba te ye
Ez jı kerba bêhış û lal û gêj ım.

**Jına Zembilfıroş :**
Mêvana eziz, te ez şaş û mıtal hiştım
Bı peyvên xwe, dı meraqê da hiştım
Rıca te lı ba mın qebûl e, ger bo te muhim be
Derman lı ba xwedê ye, te ez heyri hiştım.

Fermo bırêje jı dıl derd û meraqan
Te guhdari dıkım bı dıl û can
Ger lı ba mın e çare û derman
Bızanıbe ku texsir nakım tu caran.

**Xatûnê :**
Ez Xatûn ım, xatûna mirê vi bajari me
Evinek lı mın peyda bû, seri lı mın dıgerine
Ne mın hış maye ne dı ser da aqıl
Avêtıye kolanan, lı ber deriyan dıgerine.

Rojek jı rojên bıharê, lı ber pencerê rûnıştı bûm
Ketıbûm seyra kolan, kûr mıtale dıbûm
Ket pêş çavên mın, nışkava cıwanmêrek
Lı dıl xıst husn û bala wi, jı xwe va çûm.

Êdi bûbûm gırtiyê ber pencerê
Lı deng û didema xort dıkır çaverê
Meraqa hevditına mın û lawê feqir
Dıl jı qefesê dıpekand, davêt jı qesrê.

Dem hat û mın caringek şand pey lawık
Bı qesda "bazar bıkım zembil û selık"
*(bı gotına "zembil û selık", Jına Zembilfıroş dıqılqıle, meraqa wê zêtır dıbe û serê wê bı pırsan tıje dıbe)*
Mir çûbû seferê, dı qesrê da mabûm bı tenê
Dem û fersend bû da ku dıl bıkım hênık.

Mın xatûni û şanazi û miriti avêt aliki
Hış nemabû lı seri, daxwaz lı dû dıl terıki
Pêşkêş kır doşeka mir û sing û berê herir
Mal û mılk û çek, dewlemendi û mılûki.

Peyvên şirin jı lêvên hungıvin pere nekır
Sing û berê mın ê mırcan têr nekır
Çav û bırûyên mın, bejn û bala mın tesir nekır
Bedewiya mın, hukmê mın lawık razi nekır.

Lawık feqir bû, lê şanaz û jı halê xwe razi bû
Dılsoz bû, tu xırabi û herami dı dıl da nebû
Tesir nekır ne tehdit ne ji lavayiyên mın
Guh neda mın, bı zindankırınê qayıl bû.

Pışti demeke zindan û êş û jan
Bı fermana mın lawık anin ban
Êdi nedıfıkırim laqırdi û henek
Evineke rasti şin bûbû lı dıl û raman.

Mın xwest, evina xwe ya jı dıl û can
Pê bıdım nişandan, dûr jı derewan
Lawık jı bêçareyi qebûl kır daxwaza mın
Lê bı mana riya mısinê, xwe avêt jı bırcan.

Ez ê çı serê te ezizê bıêşinım
Ew ro, iro lawık nabinım
Lawık bı xwe Zembilfıroş e
Bê seri û berat lı dû xwe dıgerinım.

**Jına Zembilfıroş:** *(Wek insaneki ku jı xew vecınıqe û nışkava meselê fam bıke, jı cihê xwe dıpeke, şaşmayi serê xwe dıhejine û xwe bı xwe dıbe mıre mıra wê. Lê paşê bı xwe va tê û bı tewreke esalet cardın lı hember Xatûnê rûdınê û bı dengeki ne pır bılınd...)*
Te ez kuştım bı van gıli û peyvan
Jı taqet û qıdûm xıstım wek mêvan
Bê fıkar gıliyê evina xwe dıki
Jı mın guman dıki hêvi û derman.

Ez ne hêvi û dermanê te me
Ne nişangeha xencer û tirên te me
Ne hewceyê ziv û zêrên te me
Ne caring û qewraşa ber derê te me.

**Xatûnê :** *(Dıkeve telaşê û lı aşkırına Jına Zembilfıroş dıgere)*
Xuşka delal, heqê te heye tu acız bıbi
Xwe bıxeydini û gıli gazıncan bıki
Lê dıvê tu pir û marifeta xwe jı bir meki
Rasti û dılsoziya mın bı şaşi fêm neki.

**Jına Zembilfıroş:** *(bı hêrs û tınaz)*
Eger qesda te jı dılsoziyê, evina te be
Lı pêş çavan çavberdana mêrê mın be
Rasti û dılpakiya xwe jı xwe ra veşêre
Xwe rıswa meke, bı fam û fıraset be.

**Xatûnê :** *(Axinek kûr dıkşine û bı haleki melûl)*

Ez dıldarek rast ım, lı ba mın tune fen û fût
Bo mın Zembilfıroş bûye senem û pût
Rastiya xwe lı pêşberi te dıbêjım
Lewra dı dıl da tune tu xırabi û şırût.

Mın çav bernedaye mêrê te
Dılê helak mın aniye ber derê te
Mın avêt aliki xanımi û xatûni
İro jı bo çare, xwe avêtiye bextê te.

**Jına Zembilfıroş :** *(Serê xwe lı vi ali wi ali dıbe û tine û wek ku bêje "ev çı bela bû ez ketımê")*
Baş e, em bêjın ku tu dıldareka dırust i
Ez fêm nakım ku tu çı dıxwazi bı rasti
Eger te çav bernedabe mêrê mın
Tênagıhijım bo çı xwe davêji bextê mın?

**Xatûnê :** *(Jı bo rastkırına têgıhiştıneke şaş dıqılqıle. Demek dıfıkıre, xwe çêtır konsantre dıke û heta jê tê tene bı tene gotınên xwe rêz dıke, hêviya qebûlkırına daxwaza xwe wında nake)*
Pêşkêşiya daxwazê bo mın pır dıjwar e
Hêvidar ım tu lı mın negri û neki ar e
Qasek xwe dırêj kım lı rex Zembilfıroş
Bı hestên dıldariyeke ebedi pê ra bıbım yekpare.

**Jına Zembilfıroş :** *(Ecêbmayi dımine, lê jı aliki va ji, hêdi hêdi jê ra baweri çê dıbe ku evina Xatûnê ne evineke demi, ne evineke kêfborinê ye, lê dudıl e ji)*
Yani tê bı Zembilfıroş ra rakevi
Û jı mın dıxwazi jı te ra bıkım qasıdi ?
Yan tu evindareka hışavêti, yan ji şêt i
Pır gıran û zor tê tewqa ku tu lı mın dıki..

**Xatûnê :** *(Jı dıl axinek kûr dıkşine.. Demek melûl û bêdeng dımine û têderdıxe ku dılê Jına Zembilfıroş nerm dıbe. Herweha bı hêvi axaftına xwe dıdomine)*
Evin û meraqa mın rakırıye perde
Dıl jı mın dıbe, şêt dıke bı ser de
Derdê mın ne raketıne, ne kêfborin e
Yeklaşbûn e dı hest û dınya wi de.

**Jına Zembilfıroş:** *(Ketıye nav du agıran. Lı aliki ramanên alikariya Xatûnê, lı ali dın dılsoziya navbera wê û Zembilfıroş... Radıbe piya, hınek lı vi ali û wi ali dıçe û tê, herdû destê xwe rûbari jorê dıke û xwe bı xwe bêçareyi û gazınên xwe tine zıman)*
Xwedêyo! ez ê çı xweli lı serê xwe kım
Vê marûmê dı nav nivêna xwe kım
Zembilfıroş laweki dılsoz û bêqusûr e
Ez ê çawa vê tawanbariyê lı stuyê xwe kım.

**Xatûnê :** *(Jı cihê xwe dıpeke û lı pêşberi Jına Zembilfıroş dısekıne)*
Zembilfıroş çawa rast be bı te û Xwedê ra
Ez ji wısa rast ım bı evina xwe ra
Zanım û dıbinım ku evina mın yekali ye
Lê dıl jı mın çûye, ez, ne ez ım hış pê ra.

Mın tu car seri pêl nekır jı evdan ra
Hebû hukm û fermana mın jı herkesi ra
Lê eger iro bı barê avina xwe hatıbım cem te
Bızanıbe ku jı lavayi dûr, dıxwazım esaleta te.

Rast e, dı destpêkê da kêf û laqırdi bû
Lawık bo mın tenê xwestek û demborin bû
Lê pışti mın naskır sırrê esaleta Zembilfıroş

Êdi dıl lı cihana lawık tenê dıldarek gırti bû.

**Jına Zembilfıroş :** *(Bı nermayi destên Xatûnê dıke nava destê xwe û dı ber dılê wê dıde)*
Daxwaziya te wek lavayi fêm nakım
Serbılındi û şanaziya te nızım nakım
Ez qimet û gırami dıdım insanan
Paxavê bı hukm û fermandariya wan nakım.

Bı evin û meraqa te ya rast baweri tinım
Bı dılpaki û hestên te yên paqıj iman tinım
Herweha tune mın tu şık bo Zembilfıroş
Bê dudıli hêvi û daxwaziya te bı cih tinım.

*(Xatûnê û Jına Zembilfıroş hevdu hembêz dıkın. Şabûyi dıkevın suhbetek bêdeng . Elbana Derwêş û çiroka wi bılınd dıbe û hêdi hêdi sehne tari dıbe.)*

Derwêş : *(Bı ritma elbanê çirokê wek stran dıdomine)*
Zembolfıroş hate jı der da
Taqet nemabû dı çokan da
Hay tunebû jı Xatûnê
Ku lı bendê ye nav nıvin da.

Xatûna zende bı bazın,
Êdi nedkır gıli û gazın.
Lı hevdu kırıbûn herdû jın
Daxwazên Xatûn b'cih hatın.

# SEHNE VIII

<u>LİSTIKVAN :</u>

- Derwêş
- Zembilfıroş
- Xatûnê

*(Sehne kêmroni dıbe. Zembilfıroş jı derva tê hundır û jı taqet ketıye. Zembilên ser mılê xwe datine qunceki odê. Çırayê vêdıxe, lı derûdor dımıhêre û berbı zarokan dıçe. Lıhêfê davêje ser wan û berbı nıvina jına xwe dıçe. Dı şûna jına wi da Xatûnê raketiye, lê rûyê wê nayê xuyan. Zembilfıroş bı evindari lê mêze dıke, xwari ser lıhêfê dıbe ku wê şiyar bıke lê qimişi wê nakê û serê xwe bı evindari lı aliki vedıgerine û berbı kuçıkê dıçe. Qapaxê beroşê vedıke û heskê dadıgıre.Heskê derdıxe, kuçeki kevır û ava xali tê xuyan. Gava vê rewşê dıbine, jı derman dıbe û gelek ber xwe dıkeve, bı zorê pışta xwe dıde diwar û lı qûn rûdınê. Serê xwe dıxe nava destê xwe û pıştre xwe bı xwe..)*

**Zembilfıroş** : *(Jı ber bırçimayına jın û zarokên xwe, gelek dıkesıre û lı ber xwe dıkeve)*
Xwedêyo, mın dewlemendi ji feqiri ji di
Bê gazın, bı keda destê xwe wijdanê rıhet ji di
Lê iro jın û zarokên mın kevır dane ber dılê xwe
Bêhay ın jı belayê Xatûnê, serboriyên ku mın di.

Çavên mın ne lı malê dınê ye
Ne ji lı bedewiya Xatûnê ye
Lê belayek qir û qetran lı mın vebûye
Êdi jı barkırınê pêştır tu rê nine.

Mın jınek heye pır delal û dılpak e
Tenê jı wê hez dıkım bı dılek hılak e
Lı herdu dınya Xatûnê jı mın ra xwişk e
Xwedêyo tu mın jı vê belayê xılas ke.

*(Zembilfıroş qederek bêdeng dımine û dıkeve ramanên kûr. Pıştre radıbe, cılê xwe jı xwe derdıxe û lı kêleka Xatûnê, xwe lı ser pıştê dırêj dıke. Destê xwe dıxe bınê serê xwe û demekê dıfıkıre. Qederek şûnda Xatûnê, xwe lı ali Zembilfıroş dıqelêbe û destê xwe davêje stuyê wi. Lê dema ku Xatûnê xwe dıqelêbe, şıngin bı xırxalên piyên wê dıkevın û Zembilfıroş vedıcenıqe, ecêbmayi dımine.* )

**Zembilfıroş:** *(Ecêbmayi û bı dıleke pırsiyari)*
Ev çı ye, ev çı teba ye?
Ev, dengê xırxala ye...
Xırxalê jına mın tune bû?..
Bihn ji, ne bihna wê ye?..

*(Wek insaneki ku jı nışkava bı hışê xwe va were, lıhêfa ser çavê jınıkê radıke û jı nêz va lê mêze dıke.. Çı bıbine!.. Dı şûna jına wi da Xatûnê raketıye. Wek insaneki ku jı cınan bıreve, jı nava nıvinan dıpeke... Pêxwas, serqot, tena derpê û kırasê şevê deri vedıke û heta qewet dı lıngê wi da hebe dıreve.)*

**Xatûnê :** *(ew ji lı dû Zembilfıroş jı nava ciya dıpeke. Lı ser herdu çokan, herdu destên wê berbı Zembilfıroş dırêjkıri , bı axin û hewar dıqire)*
Zembilfıroş, ez dı bextê te û Xwedê me!...
Jı mın nereve, ez ne cın ım ne peri me!...
Te ez din kırım, lı çolan kırye diwane
Heta mırınê dev jı te bernadım, lı dû te me..

*(Deri bı reqin lı ser çavên wê tê gırtın. Jı taqet dıkeve û lı ser ciya , lı ser dev û rû nalin û feryadên kûr jê*

*dıçın. Demek şûnda reva Zembilfıroş dıkeve bira wê û bı wê xembariyê jı cih dıpeke û pêxwas, serqot, bı kıncên şevê bı dû Zembilfıroş dıkeve. Sehneya revê dı kuçe û kolanên tari ya şevê da derbas dıbe. Ev rev bı rabûn û ketın, bêdeng û bı didemeki pandomim demeki tê meşandın. Carna reva Zembilfıroş û carna ji ya Xatûnê tê nişandan. Pêra ji dengê elbana Derwêş hevalbendiya vê sehnê dıke, lı gor rewşa wan a sehnê ritmên xwe dıguhurine)*

# SEHNE IX

LİSTIKVAN :

- Zembilfıroş
- Xatûnê
- Gundiyên Pêşsehneyê

*(Sehne kêmroni dıbe, ango berbanga sıbê ye. Zembilfıroş dıreve û bı haleki ne hal dıgıhije quntara çiya. Dema ku dıgıhije quntara çiya jı taqet dıkeve, pışta xwe dıde zınareki û demeki bihna xwe berdıde. Pıştre berê xwe dıde Xwedê. Wê hıngê tirêjên rojê bı ser çiya da hêdi hêdi bılınd dıbe.)*

**Zembilfıroş :**

Ey Xwedayê mezın, mın dev jı miriti berda
Cih û war û hebûnê, mal û malbat bı serda
Bê xap lı rastiyê, lı wijdanek rehet geriyam
Jiyan û dınyayek nû ava kır bı keda desta.

Şa bûm, dılxweş bûm, bı wijdanek rehet bûm
Lı dınya xwe ya bıçûk, bı qısmetê xwe razi bûm
Jı pisi û xırabiya dınyayê dûr û pak bûm
Lê iro cihê revê ji bı dest nakeve, helak bûm.

Bı temenê xwe hêj gelek cıwan ım
Xwedi zar û erz û eyal ım, dızanım
Lê lı vi dınyayê mın nemaye tu guman
Bo Xatûnê wijdanê xwe gunehkar nakım.

Zanım Xatûnê ne jıneka xırab e
Ne lı dû hış, lı dû dılê helak dıreve
Bı evina xwe ra rast û durust e
Lê mıxabın ku evina wê yekali ye.

Ya reb, êdi nemaye cih û stara mın
Jı vê jiyana xweş nemaye tu hêviya mın
Xwe avêtıme dergeha te, da ku werım ba te

Bı te ra bıbım yek laş, bıstine rıhê mın,

*(Pışti gıli û lavayiyan, bı nermayi xwe lı ser pıştê dırêj dıke , herdu destê xwe lı ser singê xwe dıde ser hev û xwe teslimê mırınê dıke. Ritma elbaneya Derwêş lı gor rewşa sehne û listıkvan dıguhure û dawiyê da dıgıhije ritma hewara mırınê. Dema ku ritm dıgıhije hewara mırınê, Xatûnê bı bihneçık, bı haleki perişan, pêxwas û serqot dıgıhije ser Zembilfıroş.*
*Lı ber cendekê Zembilfıroş çok dıde erdê. Qederek bı hışmetkari lê dınıhêre, destê xwe bı evindari lı rûyê wi dıgerine —wek insaneki ku jı ditına Zembilfıroş ra hısret mabe— û jı aliki va ji hêstıran dıbarine. Elbana Derwêş ji, bı gıli û gazınên Xatûnê ra dıgri û şınê dıke)*

**Xatûnê :**
Lawıko, te ez mehrûm hêştım jı evina pak
Lı dû xwe mecnûn kırım, dıl hêşti helak
Ma dılpaki, rasti û durusti tenê para te bû
Gelo te bı bir dıani ku çawa lı mın dıbû şefaq.

Gelo te bı bir ani ku çawa qesr lı mın bû zindan,
Navê xatûni û miriti lı mın bû bareki gıran?..
Gelo te bı bir ani ku te çı agır berda nava dıl,
Bêhış û bêaqıl lı dû xwe gerand, lı kuçe û kolan?..

Gelo ew êş û janên ku mın dit û derbas kır,
Evina mın a jı dıl û kezebê ispat nedıkır?..
Ma qê ez gur û hırç bûm, tu jı mın reviyayi,
Dı dılê xwe da jı mın ra ji ciheki venekır?..

Dılê te yê paqıj, baweri û asaleta te
Şexsiyeta jı xwe emin, serbılındiya te
Wijdan û şeref, soz û bext û arama te
Lı dû te revandım, kırım muptelayê te.

Xawêni û şanaziyê bı te mın nas kır
Rasti û jiyana bêderew bı te mın nas kır
Pirozbahiya keda dest bı te mın nas kır
Bı te nas kır sırê hezkırınê, bı te mın fam kır.

Lê iro lı vê derê dırêjkıri, keti xewa ebedi,
Ez evindara Xwedê, mame bêmıraz û bêxwedi.
Ez ê çıbkım bê te, çı xweli û ari lı serê xwe kım ?..
Ya Reb!., lı kêleka wi mın ji bıke xewa ebedi..
*(dıbêje û xwe lı kêleka Zembilfıroş dırêj dıke, desteki xwe dı bın serê wi da, destê dınê ji jı jor va lı stûyê wi dıpêçe û bı wi awayi rıhê xwe teslimê mırınê dıke. )*

*(Derwêş jı cihê xwe radıbe tê ser lêva sehnê, berê xwe dıde temaşevanan û bı ritmeki kele kel serboriya Zembilfıroş û Xatûnê temam dıke. Lı dû Derwêş, jı paşiya sehnê, jı cûre cûre quncıkan gundi û zarokên "Pêşsehne" tên lı paş Derwêş kom dıbın. Dı destê heryek jı wan da fınd an ji meşaleyek heye. Cendekê Zembilfıroş û Xatûnê dı navbera wan û Derwêş da dımine.)*

Derwêş :
Evin heye yek ali ye,
Serboriya Xatûnê ye
Layıqê pesınandınê ye
Lê bê heval û hêvi ye.

Evin nabe bı kotek û zori,
Ne henek e ne ji yari,
Şireta mın bo yên mayi,
Ders bıstinın jı vi serbori!..


Eger we dit du evindar
Pışt bıdın, bıbın alikar
Dı nav wan da nebın dıri
Da ku hûn nebın tawanbar!.

*(Ev çarina jêrin, lı gel Derwêş jı ali hemû jın û mêr û zarokên sehnê tê gotın)*

Pak û rast be wek Zembilfıroş
Xwe bı erzani tu car nefroş
Nebe dil û rebenê malê dınê
Bı keda desta xwe mey bınoş.

*(Derwêş lı pêş, yên sehnê lı dû jı sehnê peya dıbın. Derwêş bı ritmeke mistik lı elbanê dıxe û herweha jı nav temaşevanan dıçın paşiya salonê û dertên der. Dema ku Derwêş û yên sehnê, jı sehnê peya dıbın pê ra ji sehne û salon tari dıbe .)*

**DAWİ**



Didemek jı Kela Zembilfıroş (cih : Farqin)

# Lı ser efsaneyan kurteraweyek

Gava mıjara "Folklor" dikeve rojevê, bi gelemperi hemû afırandinên gelêri, ango çanda gelêri rubari me dıbe. Çanda gelêri wek didem hemû cure wêneyên jiyanê radıxe pêş çavê me, wek tarix, urf û adet, felsefa jiyanê,baweri, başi û xırabi, pêwendi û heta rabûn û rûnıştınê gelek mıjarên dın diroka gelan bı iro va dıkeline, dı navbera jiyana kevn û nû da torek dırêsine. Me derheqa jiyana kevın da agahdar dıke, jı bo pêşeroja mıllet dıbe delil û pênasek dıde mıllet. Jı ber vê yekê her parçeyek çanda me ya kevın, himeki diroka me ya neteweyi ye, hebûna me ye, serfırazi û serbılındiya me ye. Gel bı riya stranan, çirokan, destanan, efsaneyan, gotınê pêşiyan, tıştenokan, deraninan, listıkan, şin û şahiyan, govend û dilanan û gelek awayên dın van bermahiyan dıspêrın hev û wek emaneteke piroz jı nıfşeki derbasi nıfşeki dın dıkın.

Jı bo ku merıv bı mıleteki ra bıkeve pêwendiyê, bıxwaze wan jı nêz va nas bıke û bı ser kurmê wan bıkeve, dıvê merıv berya her tıştı diroka wan a kevın, çanda wan, mitoloji û çirokên wan bızanıbe, hin bıbe. Jı bo nasandına gelê Kurd ji, ez vê metodê bıkêr dıbinın û dıxwazım qısmek jı bermahiyên folklora me, çanda me ya dewlemend raxım pêş çavan.

Wek gelek efsane, destan, çirok, şier, stranên me yên gelêri û gelek bermahiyên folklora me, efsaneya Zembilfroş ji, dı nav gel da hatiye gotin û bı çı kul û hali gıhiştiye serdema me. Heta ku gıhiştiye serdema me ya

iroyin, dı nav gel da gelek varyantên wi ji hatıne afırandın. Hebûna varyantan tu car nabe sedemê qelsbûna folklora me, lı ser dewlemendiya wê si çê nake. Ez bi ditınek berevajiyê wê lı vê mıjarê dınıhêrım, ango varyantên bermahiyên me yên kevın wek dewlemendiya çanda Kurdi, zimanê wi û netewe-parêziya gelê Kurd dıbinım. Lı ali dın ez hewce nabinım ku pırsa "gelo jı van varyantan kijan rast e?" ji jı xwe bıkım. Jı ber ku efsane yan ji mitolojiyan da pivanên ılmi, pivanên mantıqê xwedi hukmeki ninın. Gava behsa pivanên ılmi û mantıqê dıkım, qesd ne inkariya wan e, qesd, lêgerina bingeha rasti û nerastiya efsaneyan e. Ango em, wek ılmi nıkarın yek bı yek kevırên efsaneyê lı gor hukmê mıntıqê bı cih bıkın. Bı gotineki dın, divê merıv dı efsaneyan da lı mantıqê negere. Dı lêkolina efsaneyan da hukmê ılm û mantıqê wek metod heye, lê jı bo kıfşkırına efsaneyê û wd. heye.Dı nava berhemên folklori da efsane, bermahiyên heri kevıntırin ın. Dı afırandına efsaneyan da gel, bı baweri û fantasiyên dema xwe, şırovekırına dınya û xurıstê, bı ramanên azad berhemên folklori çêkırıne. Bı gotıneki dın, çawa lı xweşa wan çûye wısa afırandıne û ez bawer ım ku, jı xwe pırs ji nekırıne " gelo pışti me wê xelk bı van çirokan bawer bıkın an na." Lewra dı çirokên xwe da qehremanên wısa peyda kırıne ku, ew tu astengi nas nakın, qewet û qudreta wan serdestê her tışti ye; tenê bı serê xwe bı dêwên heftseri ra şer dıkın, ordiya jı hev belav dıkın; lı hespên xwe yên bayê sıwar dıbın û riya şeş mehan dıkın şeş saet; bı çengeki ava deryayê dayikên wan bı hemle dıbın û wan qehremanan jı devên xwe dıwelıdinın (wek nımûne efsaneya "Memê Alan"); jı

serê kel û bırcên bılınd xwe davêjın, lê pozê wan ji xwin nabe (wek nımûne, "Zembilfıroş") û hwd.

Lı gor raya mın rasti ew e ku, efsane, destan, çirok û yên mayin bı motivên gıranbıha, bı hostatiya zêrkeran hatıne afırandın û wek diyariyên piroz dı nav gel da hatıne parastın. Xelk jı wana hez kırıne û bı sedsalan, bı hezar salan bê nıvis, bê kıtêb û defter wana bı xwe ra heta serdema me jiyandıne.

Beri ku derbasi şırovekırına motivên folklori yên Zembilfıroş bıbım û varyantên wi rûbari hev bıkım, dıvê bête zanin ku efsaneya Zembilfıroş bêtır wek afırandıneke Melayê Bate tê pejırandın û behsa destnıvisareki ji tê kırın, lê pêra ji, hın ditın hene ku destnıvisara heyi ya Feqiyê Teyran be. Hêj bı esehi nehatıye ispatkırın ku destnıvisar a ki ye. Jakelin Sûrenovna Mûsaelyan (Kurdnas û folklorzana Sovyeti ye) dı 1978'an da 10 - 12 varyantên Zembilfıroş rûbari hev dıke û pêra ji behsa destnıvisara efsaneyê dıke. Efsaneya Zembilfıroş a ku lı jêr hatıye nıvisandın, lı navça Diyarbekır bı çiroki tê gotın. Efsane bı zarê Kurdi, jı ali mın va dı rojnameya Azadi, (hejmar.18-19, 1992), kovara Roja Nû (hejmar 33) hatıbû amadekırın û weşandın. Kovara Zanin (hejmar 7, lı Kurdıstana Sûriyê) ji, ev berevoka mın jı kovara Roja Nû wergırtiye û weşandiye.

# EFSANEYA ZEMBİLFIROŞ

*Dı serdemeki kevnare da mirek û kurek xwe hebûne. Teled-weledê mir her ew kur bûye . Jı ber wê yekê ji, lı ser desta , bı nazıki hatiye mezınkırın. Kurê mir bı ser û sincê xwe, bı xweşıkbûna xwe, bı bejın û bala xwe bê qusûr bûye. Dı wê jiyana debdebe da lawık mezın bûye, ketiye çax û bengê xwe, bûye xorteki cıwanmerd.*

*Kurê mir gelek caran bı wezirê bavê xwe ra derdıket nêçirê, derdıket seyranê. Rojeki jı rojan disa ew û wezir jı nêçirê vedıgerın malê. Lı ser riya malê dı ber gorıstaneki da derbas dıbın. Dı gorıstanê da tışteki bala kurê mir dıkşine. Lı ser rûyê goreki qafıkê serê insaneki dıbine, radıke qafıkê seri û bı meraq lê dınıhêre. Heta wê hıngê derheqa mırın û pışti mırınê tışteki hin nekıriye û nebıhistiye ji. Lewra jiyana wi ya dewlemend û rengin, cıvata dora wi jı pırseki weha dûr bûne.*

*Kurê mir bı meraq û ecebmayi jı wezirê bavê xwe pırs dıke:*

*- Wezir, tu dıkari bêji gelo ev çı hikmet e?*

*- Ev, qafıkê serê insaneki mıri ye mirê mın, dıbêje wezir.*

*- Mırın çı ye?*

*- Mirê mın, hemû insan û hemû mexlûqên bı can ên*

*rûyê dınê demeki dıjin û pıştre dımrın. Pışti mırınê wana bınax dıkın û demek şunda mıriyên bınaxkıri dıkevın vi hali.*

*- Ew jı ber bırçibûnê yan ji sedemek dın mırıne?*

*- Pêşiyên te mir bûne, lê ew ji mırıne mirê mın, jı ber ku mırın guhdariya dewlemend, feqir, cıwan û kal û pir nake. Rojeki tê herkes dıkeve tora wi, yani kes nıkare xwe jı mırınê xılas bıke.*

*- Yani tê wê maneyê ku, ez ê ji rojeki bımrım û bıkevım vi hali?*

*- Belê mirê mın, wexta roja me temam bıbe tu ji, ez ji, yani em hemû dımrın, dıbêje wezir.*

*Pışti vê xeberdanê kurê mir dıkeve ramanên kûr, dıkeve xeyalan. Hestên wi doş dıbın û evineke Xwedayi dı dılê wi da gul vedıde. Dıgıhije qesrê, bı gırin sıjde dıbe û bıryara xwe dıde ku, dev jı mal û mılkên xwe, jı miritiyê, jı jiyana debdebe berde û dı riya Xwedê da bı keda destê xwe derê jiyaneki nû lı xwe veke. Pıştre gazi jına xwe dıke, fıkır û ramanên xwe jê ra dıbêje. Û dıbê, "ez jı iro pêda dev jı hemû mal û mılkên xwe, dev jı selteneta xwe berdıdım. Ez ê êdi bı keda destê xwe jiyana xwe bıdominım. Eger tu dıxwazi bıbi şırikê vi jiyana feqir û dev jı seltenetê berdi, bı mın ra wer em ê serê xwe hıldın û jı vi welati herın. Na eger ev jiyana dewlemend bı te şirin tê û dev jê bernadi, em ê jı hev veqetın." Jına wi dev jı mêrê xwe bernade û dıbêje: "Çawa dı rojên xweşi da lı ba te bûme, dı rojên tal û teng da ji ezê lı ba te bım û jiyana te ya feqiri par vakım."*

*Kurê mir û jına wi warê bav û kalên xwe terk dıkın. Qonax bı qonax, bajar bı bajar dıgerın û aboriya xwe bı çêkırın û fırotına zembilan dıborinın. Sal û zeman*

*derbas dıbın, zarokên wan çê dıbın û roj bı roj barê wan gırantır dıbe, bli cılên ser wan tu tışteki wan namine.*

*"Zembilfıroş lawkê rewal bû,*
*Bı kulfet û ehl û eyal bû,*
*Husneki ûsıf lı bal bû*
*Heq rızaqê qısmetê."*

*Bı haleki koçemal tên bajarê Farqinê û lı wê derê bı cih dıbın. Kurê mir kolan bı kolan zembilan dıgerine û bı dıravên zembilan xwe û malbata xwe dıdebırine. Jı ber fırotına zembilan ji, navê ZEMBİLFIROŞ dıstine.*

*Rojeki wek her roj disa derketiye kolanan û zembilan dıfroşe. Jına mirê Farqinê disa derketiye ber şıbakê û çavdêriya Zembilfıroş dıke. Lewra ew ne bı dılek bı heft dılan aşıqê husn û bala Zembilfıroş bûye:*

*"Zembilfıroş zembila tine*
*Kolan bı kolan dıgerine*
*Xatûnê lı hewale dıbine*
*Hış dıçe aqıl namine."*

*Xatûna jına mir xwe ranagıre, cariye û xulaman dışine pey Zembilfıroş û wi tine qesrê. Derdê xatûnê ne bazarkırına zembilan e, vemırandına evin û agırê nava dılan e.. Xatûnê bangi Zembilfıroş dıke û dıbêje:*

*Zembilfıroş lawkê dewrêş e*
*Kerem ke tu were pêş e*
*Qimeta selka tu bêje*
*Ez jı hızna te bûm kerr û gêj e.*



(Wêne : **Ingela Jandell** "Epikên Kurdi, H.Cındi, Stockholm, 1985, Invandrarförlaget" )

*Zembilfıroş lawkê biyani*
*Kerem ke tu were bani*
*Qimeta selka tu zani*
*Xelk xam e tıştek nızani."*

*Herweha Xatûnê niyete xwe jı Zembilfıroş ra aşkera dıke û dıxawaze pê ra rakeve û eşqê bıke. Lê Zembilfıroş jı ber evina xwe ya Xwedayi û dılpakiya xwe, teklifên Xatûnê qebûl nake û bı van gotınên han bersiv dıde:*

*Xatûnê wez tobedar ım*
*Delalê bı erz û eyal ım*
*Zarok bırçi ne, lı mal ın*
*Jı ber rebê jori nıkarım.*

*Xatûnê bı hemû bedewi û serweta xwe, xwe pêşkêşi Zembilfıroş dıke, lê dıke û nake Zembilfıroş jı rê dernayê . Her cara ku Xatûnê dı ber Zembilfıroş dıde, evina dılê wê hartır dıbe û dıkeve rıkê. Xatûnê bêçare dımine û Zembilfıroş dı qesrê da hepıs dıke. Dı navê da çend roj derbas dıbın. Her rojek jı bo Xatûnê dıbe mırınek. Ew çıqas jı bo eşqê lı razikırına Zembilfıroş dıgere, Zembilfıroş ji ewqas jı bo berdana xwe lavayiya dıke:*

*"Xatûna bı gerden mori*
*Şuxul nabın bı kotek û zori*
*Tırsa mın jı rebê jori*
*Xatûnê wez tobedar ım.*

*Zembilfıroş dınıhêre ku jı destê Xatûnê xılasi tune, jı bo destavê û dest û rû şûştınê jê destûr dıxwaze. Xatûnê jı ber tırsa reva Zembilfıroş, .beneki lı lıngê wi gırê dıde, serê ben dıke destê xwe û tevi mısineki Zembilfıroş dışine bırca heri bılınd. Zembilfıroş dı bın çavdêriya xulam û eskeran da dertê serê bırcê û jı aliki va ji dıfıkıre ka çawa xwe jı destê xatûnê xılas bıke, jı wê derê bıreve. Lı ser bırcê lı der û dora xwe dınıhêre , lê tu rêyek revê û xılasiyê nabine. Wê hıngê benê lıngê xwe vedıke , serê ben bı mısinê va gırê dıde û xwe jı bırca bılınd davêje xwarê. (Ev kela han bı navê "Kela Zembilfıroş" tê bı nav kırın û ev kel lı Farqinê ye)*

*Ew kela ku Zembilfıroş xwe jê davêje, keleke wısa bılınd e ku xılasiya merıv mûcize ye. Eger çı hikmet be em nızanın, lê pozê Zembilfıroş ji xwin nabe. Hema wê hıngê radıbe ser xwe û baz dıde malê*

*Demek şunda Xatûnê dıkeve meraqê û ben dıkşine, lê dêlva Zembilfıroş da mısin tê ber destê wê. Wê gavê têdıgıhije ku Zembilfıroş reviyaye. Kêfa wê dıreve, dınya lı serê wê tari dıbe. Xatûnê jı kerba evina Zembilfıroş dıkeve haleki ne hal, şev û roj lê dıbın zindan, xeyala Zembilfıroş jı pêş çavê wê naçe. Bı vi evin û keserê cılên xwe dıguhêze û bı rojan lı kuçe û kolanên Farqinê lı mala Zembilfıroş dıgere. Dı dawiyê da dıgıhije mırazê xwe û mala Zembilfıroş dıbine. Bı cıl û ser û sincê xwe yê guhazti, kes wê nas nake. Herweha dı wexteki ku Zembilfıroş ne lı mal e, Xatûnê dıçe ba jına wi û pê ra xeber dıde. Bı lavayi, bı zêr û ziv û bı bertilan jınıkê razi dıke, yani wê dıxapine da ku şeveki dêlva jınıkê da bıkeve nav lıvinên Zembilfıroş.*

*Ew şev cılê jına Zembilfıroş lı xwe dıke, dıkeve nav*



(Wêne : **Ingela Jandell** "Epikên Kurdi, H.Cındi, Stockholm, 1985, Invandrarförlaget" )

*lıvinan û lı benda Zembilfıroş dısekıne. Derengê şevê Zembilfıroş westiyayi û jı halketi tê malê û dıkeve nava lıvinan. Çıra vemırandiye û haya Zembilfıroş jı tışteki tune. Demek şunda Xatûnê xwe dıqelêbe û berê xwe dıde Zembilfıroş. Gava Xatûnê berê xwe dıdê û xwe aliyê wi dıqelêbe, şıngini bı xırxalên zivin ên lıngê wê dıkeve. Bı dengê xırxalan, Zembilfıroş vedıcenıqe û tê derdıxe ku eva han ne jına wi ye. Lewra dızane ku, dı lıngên jına wi da xırxal tunene. Lı rûyê jınıka paşıla xwe dımıhêre û bı nıhêrtınê ra jı nava ciyan dıpeke. Xatûnê nas dıke. Hema wê hıngê bı lez xwe davêje der, serê xwe hıldıde û berê xwe dıde çiya. Xatûnê ji bı dû dıkeve û lê dıgere.*

*Zembilfıroş mêze dıke ku, rev ne çare ye û jı mırınê pêştır tu tışteki wi jı destê Xatûnê xılas nake, çok dıde erdê û bı gırin û lavayi jı Xwedê dıke da ku rıhê wi bıstine û wi jı vi ezabê xılas ke. Xwedê daxwaziya wi bı cih tine û herweha Zembilfıroş dıçe heqiya xwe, dıgıhije evina Xwedayi. Hıngê Xatûnê dıgıhije ser Zembilfıroş û mırazê wê dı dılê wê da dımine. Lı xwe dıxe, ax û fizar dıke û jı kerba evina xwe ew ji lı wê derê dıçe heqiya xwe.*

*Lı gor efsaneyê, Zembilfıroş û xatûnê lı rojhılata bakûrê Farqinê, 5,6 km dûri bajêr hatıne gor kırın.*

# Motivên Efsaneya Zembilfıroş

Dı efsaneya Zembilfıroş da gelek motivên dewlemend û cıhê (jı efsaneyên Kurdi yên dın cıhêtır) hene. Efsane, wek destan û efsaneyên Kurdi yên dın xwedi dawiniyeke trajedik e. Lê mıjara evinê, ku mıjara sereke ye, rengeki cuda nişan dıde û bı didemeki cuda folklora me ya Kurdi dewlemendtır dıke. Ya dın ji, didema tesewıfi ye, ango "evina Xwedayi" ye.

Çend motivên folklori yên sereke ev ın:

- **Terkkırına miriti û mal û mılk:** Zembilfıroş bı eslê xwe mir e û jı maleki dewlemend e. Ew jı bo xatırê baweriya xwe dev jı miriti û seltenetê ber dıde.
- **Fedakari û dılsozi:** Jına Zembilfıroş fedakariyê dıke, dev jı jiyana xweş û dewlemend ber dıde û lı hember mêrê xwe dılsozi nişan dıde.
- **Bılındkırına qedır û qimeta destkari** (sınetên desta) : Zembilfıroş dev jı hemû hebûnên xwe ber dıde û bı çêkırına zembilan û fırotına wan, ango bı keda destê xwe xwe û malbata xwe dıdebırine.
- **Evindariya bı çavpêketınek:** Xatûnê bı çavpêketına yekem benginê Zembilfıroş dıbe.
- **Evina yek ali :** Xatûnê ne bı dıleki, bı heft dılan benginê Zembilfıroş dıbe, lê ev evin yek ali dımine û Zembilfıroş bersiva vê evinê nade. Ango Xatûnê dıke û nake Zembilfıroş jı rê dernayê û pê ra ranakeve, nakeve kêf û henekan.

- **Durusti û exlaqeke payebılınd :** Ne xweşıkbûna Xatûnê, ne mal û mılk û ne ji tehdid û zor Zembilfıroş jı rê dernaxe. Ew bı malbata xwe ra sadıq dımine, bı baweriyên xwe va gırêdayi dımine û jı bo xatırê van prensiban, xwe jı kelê davêje û qesda xwekuştınê dıke.
- **Evin, hezkırın bı darê zorê nabe :** Xatûnê gelek rêyan dıcerıbine da ku bıgıhije mırazê xwe. Zembilfıroş tehdit dıke, wi dı qesrê da gırti dıhêle, lê encama van kıryaran nişan dıde ku, bı zorê tıştek naçe seri.
- **Xapandın û plana revê :** Zembilfıroş jı bo şeref û baweriyên xwe, bêçare dımine û bı plan û xapandınê jı kelê dıreve.
- **Evina Xwedayi :** Evineke Xwedayi dıkeve dılê Zembilfıroş û ew jiyaneke feqiri hıldıbjêre.
- **Qebûlbûna duayan :** Reva Zembilfıroş ji, wi jı destê Xatûnê xılas nake. Xatûnê xwe dıgıhine mala wi û heta nava lıvinên wi. Zembilfıroş êdi tu rêyeki nabine, dıreve çiya û lı wê derê lavayiyan jı Xwedê dıke da ku rıhê wi bıstine. Xwedê duayên wi qebûl dıke û bı dawiniyeke trajedik dımre.

Dı tesewufê da qebûlbûna duayan nişanek e ku, tesewufkar gıhiştıye merteba heri bılınd.

- **Evina yek ali lê rasti :** Xatûnê ji bı dû Zembilfıroş dıkeve. Xwe dıgıhine ser cendekê Zembilfıroş ê mıri. Ew ji jı kerba lı wê derê dımre.

# Kurtenasiyek lı ser varyantên Zembilfıroş

Dı bın destê mın da, jı bıli varyanta jorin, çend varyantên dın ji hene. Jı van varyantan, berevoka Heciyê Cındi ("Epikên Kurdi") û ya Ordixanê Celil-Celilê Celil ("Zargotına Kurda") temamiya efsaneya Zembilfıroş pêşkêş kırıne. Yên mayin, ango berevoka A. Sosın, berevoka Prof. Qanatê Kurdo, ya Kamûran Ali Bedırxan û wd. tenê beşek jı efsaneyê (bı şıêrki) pêşkêş dıkın û berevokên wan bı naveroka xwe wek varyanta jorin e. Lê dı berevokên Heciyê Cındi û Ordixanê Celil -Celilê Celil da hın cudayi hene. Eger merıv varyanta vê pırtûkê û yên Kurdên Sovyet bıde ber hev, tabloyeke weha dertê pêş:

**Danberhev 1-** Destpêka çiroka Zembilfıroş ne wek hev ın. Lewra dı çiroka jorin da Zembilfıroş, dı destpêkê da wek kurê Mirek bı hukım û hebûn tê nasandın. Ew pıştre derbasi jiyaneke feqiri dıbe û jı ber baweriyên xwe bı keda destê xwe jiyana xwe dıdomine. Ev mıjar, dı berevokên H.Cındi û yên dın da ne xuyaye, ango çirok bê seri ye.

**Danberhev 2-** Dı varyanta jorin da, jına zembilfıroş wek jıneke dılsoz tê xuyan. Gava Xatûnê tê mala Zembilfıroş, lavayiyan jı jına wi dıke û derd û evina xwe jê ra dıbêje, dılê jına Zembilfıroş pê dışewıte û bı vi awayi destûr dıde Xatûnê da ku dı nav nıvinên wê

da rakeve. Lê dı berevoka O. Celil û Celilê Celil da, jına Zembilfıroş tımatiya malê dınê dıke û jı bo pere û zêr û ziv Xatûnê dı nav nıvinên xwe da dıde razandın.

**Danberhev 3** - Ne wekheviya dawiya çirokê ye. Dı çiroka jorin da Zembilfıroş dı nav qesrê da û lı ba Xatûnê tê hepıs kırın. Mirê Farqinê, ango mêrê Xatûnê ne lı mal e. Lê ev mıjar dı berevoka Heciyê Cındi ("Epikên Kurdi") da rengeki dın stendiye, ango Zembilfıroş bı fermana Mirê Farqinê tê zindankırın û kuştına Mirê Farqinê bı destê Zembilfıroş tê nişandan!.. Newekheviyeke dın ji, dı varyantên "Zargotına Kurda" da heye. Dı varyanta yekem da, dema ku Zembilfıroş pê dıhıse ku Xatûn dı nav nıvina wi da hema wê hıngê dıbe teyreki sıpi û jı kulekê dıreve dıçe. Beri çûndına xwe jı Xatûnê ra dıbêje, *"kengê te solek û gopalek hesın qetand, tê paşê mın bıbini."* Herweha heft sal derbas dıbe û rojeki Xatûnê, lı navsera çiyayek rasti Zembilfıroş û sê horiyên ba wi dıbe. Xatûnê û Zembilfıroş lı wê derê dıbın xwişk û bırayê hev û pıştre Xatûnê dıçe heqiya xwe. Bı kurti pıştı heft salan xatûnê dımre û Zembilfıroş bı destê xwe wi vedışêre. Lı vê derê ji, derbari mırına Zembilfıroş da tevlıheviyek heye. Jı aliki va peyvên "**teyreki sıpi**", "**sê hori**" işareta mırınê û cennetê ne, lê lı ali dın pıştı heft salan hevditına Xatûnê û Zembilfıroş lı navsera çiyayek saxiya Zembilfıroş dıde xuyan. Pırsa xwişk û bıratiya herduyan ji, evina Xatûnê ya yekali bê mane dıke û vê evinê jı qimet dıxine, ango lêzêdekırıneke ne baş e.

**Danberhev 4** - Reva Zembilfıroş e. Dı çiroka jorin da Zembilfıroş, bêçare dımine û xwe jı kelê davêje xwarê (navê "Kela Zembilfıroş" a Farqinê ji, xasıma jı

ber vê bûyerê ye). Lê lı gor varyanta H. Cındi Zembilfıroş, pışti kuştına Mirê Farqinê derê zindanê vedıke û bı peyati dıreve.

Ev kuştın lı felsefa tesewıfi ya çirokê nayê, jı karektera qehremanê çirokê ra ters dıkeve.Herweki ku dı varyanteki O.Celil û C.Celil da ji, Zembilfıroş lı baxçê qesra Xatûnê dıziya zıl an ji şıveterkan dıke, dergevanên Xatûnê wi dıgrın û tinın balê û herweha Xatûnê wi dıbine û dıbe bengiyê wi. Xatûnê jê dıxwaze ku, Zembilfıroş dotıra rojê zembilên xwe yên sıpehi bine. Zembilfıroş zembilan tine, dızi têr nake ica lı pêşberi pencera Xatûnê "miz" dıke û Xatûnê, wi jı pencerê dıbine... Wek mın lı pêş ji got, kuştın, dızi û lı pêş penceran mizkırın qet ne tıştên dı cih da ne û lı ser çirokê siyeki tari çê dıkın, bedewiya efsaneyê xera dıkın û pênasek nebaş dıdın Zembilfıroş. Ew Zembilfıroşê dılpak û rastparêz, dıxe kıraseki dız û tolaz...

Çirokên kevn dı dırêjahiya sedsalan da, lı ser zarê çirokbêjan gelek nexş û motivan werdıgırın. Ev tıştekî xurısti ye, eger bı taybeti ji bı devki gıhiştıbe serdema me û destnıvisarên wan ne lı meydanê bın. Gelek caran ev nexş û motivên nû yên ku lı çirok û hwd. tên zêdekırın dewlemendiyeke xweser dıdın berhemên folklori. Qesd jı dewlemendiyê ew e ku, eger bıngeha berhemên kevn hatıbın parastın û bıngeha parasti restore bûbe, hatıbe nexşandın. Dewlemendiyeke weha kare tameki xweştır ji bıde merıv. Na eger wek minakên "Zargotına Kurda" be, kare tama heyi ji bıkuje, berhemê asimile bıke û jı eslê wi dûr bıke.

**Danberhev 5** - Dı varyantên Zembilfıroş ên "Epikên Kurdi" û "Zargotına Kurda" da, Zembilfıroş, rengeke balkêş dıstine!.. Ango, Zembilfıroş wek Êzidi tê xuyan

û ev rengê han dı hersê varyantên Kurdên Sovyet da ji dertê pêş . Lê dı varyantên Kurdıstanê da, ew bı felsefa tesewıfi ya islami tê rawekırın. Eger ev efsane jı ali Melayê Batê yan ji Feqiyê Teyran hatıbe nıvisandın, şık tuneye ku ew bı rıheki islami hatıye afırandın.

Lı gor raya mın ev mıjara balkêş, xusûsiyeteki Kurdan ê dın ji radıxe pêş çavan. Ev xusûsiyet ji ev e, ku olên cuda nebûne sedemê nakoki û berberiyên navbera Kurdan. Ango, dı jiyandına bermahiyên neteweyi da, din çı dıbe bıla bıbe, bı rıhê Kurditi çirok û hemû berhemên gelêri hatıne parastın, hatıne hezkırın û her yek jı wan bê zordayinê van berheman wek malê xwe hembêz kırıne û jiyandıne. Bı gotıneki dın, rıhê Kurditi raseri olên Kurdan (musulmani, êziditi, fılehi, cıhûti, elewiti û wd) bûye.

Mın lı jorê ji got, ku em dı efsaneyan da lı rastiya mantıqi nagerın. Lê eger destnıvisara Zembilfıroş, a ku me lı pêş behsa wê kır dı destê me da hebûya, wê hıngê merıv dıkarıbû varyantan baştır rûbari hev bıkıra û bızanibûya ka kijan varyant wek destnıvisarê ye, kijan navçeyi ye, kijan dı bın tesira din da maye, kijan û bı çı awayi lı gor devoka navçeyi hatiye jiyandın û çı cûre zêdayi lê hatıne zêdekırın wd. rawe bıkıra û ditınê xwe pêşkêş bıkıra.

# Zembilfıroş û riya tesewufê

Wek tê zanin efsaneya Zembilfıroş efsaneyeke tesewufi ye û bı taybeti ji, jı ali derwêşan an ji dindaran hatıye gotın. Jı ber vê yekê pêwist e ku ez bı kurti lı ser tesewufê rawestım û pıştre dı çarçeva tesewufê da cihê Zembilfıroş bıdım xuyan. Bêguman mıjara tesewufê mıjareke gelek aloz û dıjwar e. Dı her dini da lı ser bıngeha felsefeyek tê meşandın û xwedi rengeki cıhê ye. Destnişankırına hemû wêneyên tesewufê ne kareki hêsa ye û pıspori dıxwaze. Mın lı vê derê wêneya bıngehin a islami hılbıjartıye û wêneya ku lı Zembilfıroş û riya wi ya tesewufê tê şırovekırıye.

Tesewuf an ji bı gotıneki dın Sofiti, reh û riçalên xwe yên jiyanê jı ol dıstine. Ew fıkır û ramaneke oli û sıri ye. Rastiya raman û armancên sofitiyê tucar bı awayeki aşkera nayê kıfş kırın. Xusûsiyeta wi ya heri mezın, felsefa wi ya sıri ye.

Dı felsefa sofitiyê da bı riya aqıl û hestan bı Xwedê ra pêwendi danin heye, pê ra jiyan heye. Ev baweriya sıri pıri caran bı rengê evina Xwedê xwe dıde nişandan. Lê ev bengini dı edebiyata tesewıfi da, xwe wek evina Xwedê aşkera bı nav nake. Ev evin pıri caran wek evina navbera sofi û keçekê, wek têkıliya navbera mey û meyxur an ji tıştеki abstrak dıkare bête xuyan. Her wısa dı edebiyatê da tesewıf, pıri caran bı hın sembolan tên rawekırın û xuyan. Wek minak, van

peyvên sembolik dı van maneyan da hatıne bı kar anin: "**Bengin**": kesê ku bı evina Xwedê dışewıte; "**maşûq**": Xwedê; "**mey**": evina Xwedê; "**saki**": rêber; "**meyxane**": dergeh.

Dı sofitiyê da armanc û hedefên oli, bı metod û rêyên aşkera yên gelêri nayên bı kar anin. Gıhiştına armancê bı metodek sıri, bı riya aqıl û hestan tê meşandın. Ango bı riya aqıl û hestan sofi dıgıhije Xwedê, xwe dı raman û hestên xwe da dıkuje, dıbe şırikê jiyana Xwedê û bı vi awayi dıgıhije nemıriyê.

Gava merıv lı diroka sofitiyê hûr dıbe, dıbine ku dı sofitiya pêşin da felsefeki weha tune. Sofiyên ewıl dıketın sılûkê û destê xwe jı kar û barên dınyayi dıkışandın. Jiyanake ferdi û oli hıldıbjartın. Xwe tenê dıdan perestın û erkên oli. Haya wan jı ılm tune bû û lı ser mane û şırovekırına pırtûkên oli yên piroz nedısekınin. Ango bı nezani û xemkêşi, olperestiyeki bêhed dıdomandın. Bêguman sofitiyeki weha dıgıhije fanatikiya koriti. Baweri ew e ku, sofiyên weha jiyana Hz. Muhemmed wek nımûne dıgrın û dıxwazın dırûvê jiyana xwe bı yê Hz. Muhemmed xın. Lewra gava Hz. Muhemmed ji, jı bo pêxemberiya islamê xwe amade kırıbû, ew ji wek pêxemberên bori (Zerdeşt, Isa, Mûsa, Bûda û hwd.) jiyaneke weha hılbıjartıbû.

Sofitiya ku xwe bı tenê dıspart olperestiyeki saf û erkên oli, dı nava zeman da guhuri û bı felsefeyeki mistik rengeki dın stend. Bı felsefa panteisti û batıniti, sofiti du fam û fırasetên bıngehin wergırt. Ew ji felsefa wahdet-i wucûd û şırovekırına wi yê sıri ye. Lı gor felsefa wahdet-i wucût afırandêr (Xwedê) û afırandi (insan-sofi) eyni tışt e, jı eyni çavkaniyê tên. Bı gotıneki dın, insan sûretê Xwedê ye, didemek wi ye.

Bı felsefa panteist û batıniti, tesewıf dıgıhije van qonaxan:

**Qonaxa İlmelyeqin :** Dı vê qonaxê da sofi wek her insanên normal lı ol dınıhêre û erkên wi ji wek insanên dın bı cih tine. Lê beri her tışti ji, tobe dıke û jiyana xwe ya kevn davêje aliki.

**Qonaxa Aynelyeqin :** Dı vê qonaxê da sofi, jı tıştên diti derbasi tıştên nediti dıbe, dıkeve kûrahiya ol.

**Qonaxa Heqelyeqin :** Dı vê qonaxê da sofi, dıgıhije armancên rasti yên oli û dı baweriyeke tam û qewi da dımre û dı Xwedê da dıgıhije nemıriyê.

Lı ser vê qonaxa dawi Cuneyd-i Baxdadi weha dıbêe: "*Tesewıf, tê wê maneyê ku Xwedê te dı te bı xwe da dıkuje û bı xwe ra dıde jiyandın.*" Zanyarê sofitiyê yê navdar İmam Gazali (1055-1111) ji weha dıbêje: "*Sofiti, nêzikbûna Xwedê ye*" û weha berdewam dıke, "*eger merıv xwediyê van cewheran be dıkare bıbe sofi: 1- Xwe bı Xwedê va gırêdan û xemkışandın (el-muraqabe). 2- Lı fıkır û ramanên kûr xerikbûn (el-tefekkur). 3- Dayina bê bersiv an ji bê daxwazi (el-mewaqib). 4- Jı xwe va çûn (el-wecd)* " Herweha lı gor Gazali, eger merıv dev jı hemû daxwaziyên xwe berde dıkare bıgıhije Xwedê û wd. Disa lı gor Muhyedin Erebi (1162-1240), ku wek zanyarê sofitiyê yê duyemin tê naskırın, felsefa sofitiyê weha tê şırovekırın: "Hemû pırs, dı pırsa Xwedê da dıcıvın û bı wi tên rawekırın. Dı hemû tıştên cihani da Xwedê tê xuyan, kesê ku evindarê tıştekì bûbe dı rastiyê da ew evindarê Xwedê dıbe".

Gıhiştına qata Xwedê û pêra jiyan, felsefe û armanca bıngehin a sofitiyê ye. Ev ditın jı ali gelek zanyarên tesewufê va hatiye zıman.

Em ê rawekırına sofitiyê bı jêderkeke pırtûka Prof. Annemarie Schimmel kuta bıkın : "*Lı ser Sofiti yan ji Tesewıfê nıvisandın gelek zehmet e. Bı gavê pêşin ra, zıncira çiyayan dertê pêşiya merıv, eger merıv bıxwaze meşa xwe bıdomine, dı her gavi da gıhiştına hedefê dıjwartır dıbe. Herweha merıv careki bıgıhije wê derê, dıbine ku, ew cihê ku merıv gıhiştiyê dı nava merıv bı xwe da ye.*"

Dema ku em hınek lı tasawufê hûr dıbın, rasti sê nişanên bıngehin yên ku Zembilfıroş dıxe riya tasawufê û efsaneyê ji dı edebiyata Kurdi ya tasawufi da dıke nımûneya yekta tên:

1- Bı bandora mırınê yan ji qafıkê seri, Zembilfıroş çawa bı xwe ra dıkeve hesabeki û dev jı jiyana miriti berdıde.

Dı efsaneya Zembilfıroş da bûyera qafıkê seri, lı gor tesewufê wek nişaneke hukmê Xwedê dertê pêş û bı vi awayi berê insanan dıkeve jiyaneki dini yê ku bı hın qaideyan hatıye sinorkırın. Bêguman minaka qafıkê seri tenê bı Zembilfıroş ne sinorkıri ye, wek nımûne ev motivê dini dı çiroka jiyana Bûda da ji tê xuyan.

Eger merıv lı jiyana şexsiyetên dini hûr bıbe, belki kare gelek nımûneyên dın ji bıde... Dı minakên weha da, pevgırêka şırik jı bo hemûyan motiva dini ye û her bı tenê hukumdariya Xwedê ye. Jı bo Xwedê bıcihanina sedeqetê ye. Bı gotıneki dın jı bo Zembilfıroş, qafıkê seri yê efsaneyê wek balkêşdarek û qeweteke Xwedayi tê xuyan.

Jı bo kesên ku dıkevın riya tesewufê, pıri caran işareteki balkêşiyê pêwist hatıye ditın, rêberên wek şêx, seyid an ji pir hatıne pêşniyar kırın. Lê balkêş e ku, tesewufkarên Kurdıstanê yên naskıri dı riya tese-

wufê da bı tena serê xwe meşiyane. Wek şaırê mezın ê yekta yê tesewufê Melayê Ciziri, Weysel Qerani û Zembilfıroş. Ev şexsiyetên han jı bo armancên xwe û evina Xwedayi rêber bı kar neanine, merıv an ji rêberek nekırıne navbera xwe û Xwedê.

Xusûsiyeteke gıring ji, miriti û dewlemendiya Zembilfıroş e. Lewra dema ku mıjara jiyaneki derdkêşi û feqiri dı rojevê da be, dıvê ku qehremanê bûyerê dewlemend be û jı bo ku bıgıhije armanceki dini û xwedayi dev jı jiyana dewlemend berde. Eger ne bı vi rengê be efsane nayê afırandın, lewra feqir jı xwe wek xurısti xwedi jiyaneki bı derd û kul ın û tên zêrandın. Ew, jı xwe herdem pençe mırınê ya sar lı ser çema stuyê xwe his dıkın û bı wi xofê dıjin. Cardın dubarekırına jiyaneki feqiri, berdewamiya eyni jiyanê ye û tu aliyeki wi yê balkêş tune.

2- Bı tobekırınê, bı derdkêşi lêgerina mırıneki saf, paqıj û jı hemû cûre xırabiyan dûr.

Mıjara tobeyê, jı bo tesewıfkaran pêplûka yekem û bıngehin e. Bêyi wi ketına riya tesewufê hema bêje ne mumkun e. Lewra lı gor bawermendên tesewufi, jı bo ku insanek jı gunehan, jı xırabiyan paqıj bıbe beri her tışti ji, jı serbori û jiyana xwe ya kevn pak bıbe dıvê tobe bıkın, soz bıdın Xwedê. Û bı vi awayi dı nav çarçeveyeki sinorkıri ya dini da hakımê nefsa xwe bıbın, lı hember xırabiyan dı ber xwe dın, lı ber nimetên dınyayi seri daneynın, bı sedeqet tenê berê xwe bıdın Xwedê û fermanên wi û bı vi rengi bıkevın jiyaneki derdkêşi. Tıştê ku dı Zembilfıroş da ji tê xuyan ev e. Lewra dema ku dı efsaneyê da Zembilfıroş û Xatûnê rûbari hev dıbın, armanc imtihankırına Zembilfıroş e. Lı hember bedewiya Xatûnê û banga

wê ya ku hestên seksi şiyar dıke, Zembilfıroş tê cerıbandın ku ka wê jı nefsa xwe ra hakım bıbe ya na, wê jı bo mal û mılk, dewlemendi û hukumdariyê tıma bıbe ya na û bı vi awayi wê jı toba xwe ra sadıq bımine ya na. Û jıxwe wek ku dı efsaneyê da ji tê xuyan, dema ku Zembilfıroş û Xatûnê tên hember hev tevi hemû ısrarên Xatûnê, Zembilfıroş dı her fırsendi da weha dıbêje,

*Xatûnê ez tobedar ım*
*Delalê ez tobedar ım*
*Xwedi erz û eyal ım*
*Jı xalqê jori ez nıkarım.*

û ev ji dıbe minakeke berbıçav ku Zembilfıroş tobe kırıye û dıxwaze bı toba xwe ra sadıq bımine.

Pêwist e ku lı vê derê merıv xusûsiyeteki gıring ji, ku lı ba Zembilfıroş xurt e, destnişan bıke. Zembilfıroş, wek tesewıfkarên dın jiyaneki naskıri hılnebıjartiye, bı temami destê xwe jı dınyayê neşûştiye û lı ber derê şêxeki xwe nedaye zêrandın da ku jı hın mertebeyan derbas bıbe û rojeki zûtır bıgıhije mırın û armancê. Berevajiyê vê rêyê, dema ku jiyana feqiri hıldıbjêre û dev jı hemû hebûna xwe berdıde, jiyana xwe ya sade û paqıj bı karê destkari dıxemıline û bı keda destên xwe, ango bı çêkırına zembil û fırotına wan xwe dıdebırine û lı hember dıjwariyên jiyanê riya berxwedanê hıldıbjêre. Bı vi awayi hım muhtacê kesi nabe, hım dindariya tırali mehkûm dıke, hım ji bıxwebawerbûnê dıke rojeva tesewufê, lewra qedera xwe nake destê şêx û seyidan û rê nade ku bı destûra wan qonaxên mertebeyên wi bête kıfşkırın.

Herweha beri ku Zembilfıroş û Xatûnê bên hemberi

hev, jı bo mırın û derketına diwana Xwedê lez nake. Bêyi ku mırınê bıfıkıre, doza xwe dıdomine.

3- Evina Xwedayi û bı Xwedê ra yekparebûn.

Ev qonax, dı tesewufê da merteba heri bılınd e. Hemû derd û xemên ku tesewufkar dıkşine, jı bo ku dı hest û ramanên xwe da bı evina Xwedê têr bıbe . Eger dı hemû tıştê dınê da Xwedê bête xuyan û ev dı raman û hestên tesewufkar da gıhiştıbe, ev dıbe işaret ku bı Xwedê ra dema yekparebûnê hatıye. Êdi jı bo tesewıfkar, dema huzûrê ye, dema şabûnê ye ku bı Xwedê ra bıbe yek laş, bıbe parçeyek jı Xwedê û bı vi awayi bıbe Xwedê. Dı vê qonaxê da her demek ku mırın dıewıqe, jı bo tesewıfkar dıbe êşkenceyek mezın. Lewra paşketına mırınê, jı bo tesewufkar xeter e êdi. Herdem tırsa şaşiyek, jırêderketınek an ji gunehek heye û ehlê tesewıfê naxwaze pıştı ewqas cefa û zêrandın vê qonaxa heri piroz jı destê xwe bırevine.

Pıştı vi kurteraweyê eger em dı vê qonaxê da rewşa Zembilfıroş raçav bıkın, dıbinın ku lı ba Zembolfıroş ji eyni tışt heye. Lê, lı gor seyra efsaneyê tevi ku Zembilfıroş gıhaye mertebeya heri bılınd ji, wısa tê xuyan ew jı bo mırınê lez nake. Ango daxwaza jiyaneki dırêj bı gelek awayan xwe nişan dıde. Xusûsiyeteke dın ji ew e ku, bê rêber e, bı tena serê xwe û baweriya xwe qewlên vê qonaxê bı cih tine(bo şırovekırına vê pırsê lı nişana duyem a ku Zembilfıroş dıke riya tesewıfê bınıhêre)

Dıgel viya hezkırın û pevgırêdana wi bı jın û zarokên xwe ra, berpırsiyariya debırandına wan sedemeke xurt ê dın e. Ango xwe tenê xeriki evina xwedayi û armanca xwe nake, jı bo hın kesên dın ji berpırsiyari his dıke û bı vi awayi dı riya tesewufê da bı cot berpırsiyari he-

reket dıke. Ev gotınên jêr vê ditına me ispat dıke :

Herweha beri ku Zembilfıroş û Xatûnê bên hemberi hev, jı bo mırın û derketına diwana Xwedê lez nake. Bêyi ku mırınê bıfıkıre, doza xwe dıdomine.

*Zembilfıroş lawkê rewal bû*
*Bı kulfet û ehl û eyal bû*
*Husneki Ûsıf lı bal bû*
*Heq rızaqê qısmetê.*

............

*Xatûnê lı mın meke van henekan*
*Ew pêkeninê qiz û bûkan*
*Mın berde herme sûkan*
*Bıfroşım van selıkan*
*Pê bıkırım nanê zarokan.*

.............

*Gul Xatûn ez tobedar ım*
*Hurmetê ez bı erz û eyal ım*
*Zarok bırçine lı mal ın*
*Ez jı rebê jori nıkarım....*

Minakên jorin xweş tinın zıman ku çawa Zembilfıroş hım jı bo Xwedê û evina wê hım ji jı bo jın û zarokên xwe cot berpırsiyari daye ser mılê xwe.

Û dı dawiya efsaneyê da em dıbinın ku, Zembilfıroş pıştì zordayinekê mırınê hıldıbjêre. Daxwaz û zordayina Xatûnê û destên wê yên ku dırêji her deri dıbın, Zembilfıroş bêçare dıhêle, jı bo hılbıjartına mırınê bıngeh hazır dıke. Jıxwe dema ku mırınê hıldıbjêre, dı cih da duayên wi qebûl dıbın. Qebûlbûna duayan, nişana kamılbûna merteba wi û bı Xwedê ra yekparebûnê ye dı tesewufê da.

Ev efsane dı edebiyata me ya tesewufi da mırcaneke yekta ye. Bı taybeti lı Kurdıstana Bakûr, dı edebiyata me ya nıviski da zêde cih negırtıye û nehatiye nıvisandın. Daxwaziya mın ew bû ku, ev efsane bı gelek şêweyan bête naskırın. Lewra ji, mın Zembilfıroş bı zımaneki tiyatral, wek piyes nıvisi da ku bı vê şêweyê ji dı nav gel da belav bıbe, felsefa jiyanê ya Zembilfıroş bête nasin, dı navbera wê û felsefe û kultura iroyin da pırek saz bıbe. Her çıqas efsane xwedi kıraseke tesewufi ye ji, gelek motivên wê yên exlaqi û kulturi balkêş ın, karın bıbın dersdarê serdema iroyin. Bêguman dersgırtın gırêdayi şırovekırınê ye, lê çend motiv hene ku jı bo herkesi û herdem derbas dıbın. Wek, exlaqeki bılınd, baweriya xurt, rasti û durusti, jıhevnaskırına başi û xırabi, rûmeta sınet û keda dest û hwd.